# Ronahî

Şopdara Rastiyê ye

Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1338 | 31-Berfanbar-2025 | www.ronahi.net/ku/



**Navnîşan**

www.ronahi.net/ku/ | rojnameyaronahi | @ronahikurdi55

nameronahi@gmail.com | Rojnameya Ronahî | +963 984 370 218


# Kêla Memê bedewiya Botana rengîn e

**Asya Waşûkanî**

Kêla memê bi bilindahî û bedewiya xwe di herêma Botanê de, têye naskirin û her dem berxwedêr û serbilinde li hemberî, hemû sir, seqem û dijwariya demsala zivistana dirêj e. Di demsala biharê de jî ser serê kêla Memê bi rengên cur bi cure, giyahan di xemile û gulên sor, zer, sipî û benefşî rengê xwe dide û xweşikbûna bedena kêla Memê zêdetir dike. Kêla navdar xwedî heybetmendî û manzarayên balkêşe, mirovan bi xwe ve dide girêdan dema ku mirov temaşey xwezaya li ser serê Kêlê dike mirov ji xweşikbun û bilindbûyina wê matmayî dimîne, bandora xwe ya pir xurt li ser hişê mirovan, dike û wan dike nava xeyalên bihişta pak de. Wekê ku têye zanîn hîna berfa bi salan li ser serê Kêla Memê, bi komî maye û her sal kêl pêşwaziya berfa sala nû dike.

Tesewir û xeyal bikin ku mirov dinava havîna germ de, berfa demsala sivistana sala bûrî yan jî salên bûrî tam bike û pêkêfxweş bibe yan jî ku bi hinek, şekir, dimis û şîr re hevlihev bike û bixwe ji bo ku ji dayika xwezayê re sipasî bike. Ew berfa sar di demsala havîna germ de dilê mirovan, hênik dike û westana mirovan ji holê radike. Nexasim jî dema ku gerîla li ser serê wî rêze çiyayî re, gav bi gav dimeşe û diweste û bi bêhin vedanê re; berê xwe dide berfa li keviyên çiya û gulokên berfa sipî, radike û tîbûna xwe pêdişkîne hemû westana xwe ji bîrve dike. Li ser Kêla Memê di havînê de hîna giyayên nazik li ber bayê dilan digirtin. Gulên li ber keviyên berfa sipî ji xêr û bereketa, wê dewlemed û renga reng dibûn. Û gerîlayên jin ên dilnazik ew kulîlkên li ser çiyayê, Kêla Memê dikirin nava lênusên xwe de û li ser wan; helbest rêz dikirin.

Her dema ku sersal, pîrozbahî û cejin dihatin wan, jî li ser xaqezên lênuskên xwe bi perên wan çîçekan şikilên pir bedew; çêdikirin û ji hevdû re bi nivîsa sersala te pîroz be, çend hevok di hunandin. Ji wan gulên bi çûk û kulîlkan li ser lênusên xwe şikil, çêdikirin û carnan li ser lênusên xwe; wêneyê Rêber Apo bicih dikirin û li dora wêneyê wê jî gul û çîçekên, rêzdikirin û ewqasî rengên xweişk çêdikirin ku mirov ji bedewiya wan kêfxweş dibû. Di germahiya heyva tebaxê de û nexasim jî dema ku gerîla ji çalekiyan, dihatin û pala xwe didan kevirekî yan jî zinarekî Kêla Memê; hemû westana xwe ji bîrve dikirin û bedewiya Kêlê ew têr dikir. Û nexasim jî dema ku gerîla westiyayî û têni ji çalakiyê, dihatin û firek av ji kaniyên sar ên Kêlê vedixwarin ji wan re; weke ava zem zemê dihat û ew ava weke qeşayê, hinavê wan ê germ sar dikir.



Piştî xeweke şêrîn gerîlayên çeleng çavê xwe li rojeke, nû vedikirin û tîrêjê tava sor li rûyê wan dida û dizanîn ku rojeke nû; hatiye û gerek rabin ser piyan û rext û çekên xwe bişidînin û xwe ji bo çalakiyeke, nû hazir bikin. Û carnan jî di wan rojên xweş û geş de ku gerîla, hîna nû çavê xwe bi rojbaşê re vekiriye û dengê guleyên leşgeran; bi ber guhê wan dikeve û hema bi lez û bêderengî xwe hazir, dikin û berê xwe didin ciyê ku jê dengê guleyan tê. Û her jiyana gerîla wiha bi xweşî û nexweşî bû, ji xwe carnan jî dinava pefçûnê de heval birîndar, yan jî şehîd diketin û vê rewşê jî; bi xwe re zor û zehmetiyên hestiyarî tanîn. Û dema ku ew hevalên xwe yên ku bi salan bi hevre, diman û jiyana xwe li ser xweşî û nexweşiyê pareve dikirin; wenda kirin gelekî bandor dibûn û bi salan bîranînên, hevalên xwe bi xwe re radikirin. Weke ku me li jor jî qala wê kir û me got: Kêla Memê bi salan mêvan perwerî ji gerîla re kir û hîna, jî wê pêşwaziyê ji gerîla re dike û gelek gerîlayên qehreman jî; dinava xaka xwe de hewandiye û bi xwîna wan hîn bi qîmetir bûye û navên, zêrîn li navê Kêla Memê zêde kiriye. Ji xwe herêma Botanê bi tevahî ciyê gerîla bûye û hîna jî gelek gerîlayên, ku ciyê wan tirbên wan nediyare dinava xaka Kêla Memê û tevahî Botanê de; parastîne û heye ku wê rojekê qeder bêye ku em cih bi cih li çiya û newalên, wan çiyayn bigerin û laşê wan şehîdên xwe yên qehreman derxînin. Û wan dinava pekrewangehan de bicih bikin ji bo ku aram dinava, heval û hogirên xwe de jiyan bikin û di merqeda xwe ya pîroz de xeweke ebedî bikin. Û piştî serkeftinê gel, heval û dostên wan herin ber serê kêlkên wan û ji wan re; bibêjin: Mizgîn be ji were ey şehîdên qehreman û gel her wan bidin jiyan kirin.

Mijara herî xembar jî ewe ku bi dehan şehîdên qehreman, dinava newala Qesaban de ciyê xwe digirin û nexasim jî cesedê; fermandarê me yê mezin Mahsum Kurkimaz jî dinava wê newalê de, binaxkiriye û ev jî gelek êş û xebariyê dide me. Û em sozdidin ku emê ji bo hatina, wê roja serfiraz ku em şehîdên xwe di ciyê wan ê layiq de; veşrên têkoşîneke pir xurt ji me têye xwestin ji bo ku em layiqî; qehremanî û fedayî bûna wan werin. Bi mebesta vê bîranîna bi wate careke din ez hemû şehîdên, şoreşê bibîrtînim û bejna xwe li hemberî bîranîşna wan ditewînim û soza; xwe ji wan şêre jin û mêrxasan re nû dikim.

## FERHENGA BIWÊJAN

**Anî rê/anî ser rê:**
- Pê da qebûlkirin.

**Anî ser xwe:**
- Qebûl kir ku wî ew kar kiriye, yan ew gotin gotiye.
-Destpêkê qebûl nekir, lêbelê di dawiyê de anî ser xwe.

**Barê hîştirê li kerê nayê kirin:**
- Divê her kes hinge hêza xwe erk bigire.

**Çekê xwe danî:**
- Rastî qebûl kir.

**Da ber çavê xwe:**
- Pejirand; qebûl kir; xwe jê re amade kir.

**Daqurtand:**
- Bê xwestaka xwe qebûl kir.

**Devê xwe sist kir:**
- Nêzîkî qebûlê bû; hindik maye qebûl bike.

**Di çav xwe re kir:**
- Pejirand; qebûl kir.

**Ez bêçek kirim:**
- Ew heq ez neheq derketim; şaşiya min bi min da qebûlkirin; êdî ti gotinên min neman.

**Guhên wî dapêlî bûn:**
-Kêmayiyên wî hatin dîtin.

**Guhên xwe dapêlî kirin:**
- Kêmayiyên xwe qebûl kirin.

Gunehên xwe danîn ser perê xwe/ gunehên xwe girtin ser perê xwe:
- Kêmayiyên xwe qebûl kirin; rexneyên xwe dan.

**Gû bi xwe ve dît:**
- Çewtiya xwe dît; bi kêmayiya xwe hesiya.

**Hat ber nîr:**
- Destpêkê xwe ber re nekir lê pişt re qebûl kir.


**Hat rê:**
- Qebûl kir; xwe ber re kir.

**Hat xişexişê:**
-Hat ser rastiyê; rastî qebûl kir.

**Heke li te xweş e, li min bîst û şeş e:**
- Eger tu qebûl dikî, min ji zû ve qebûl kiriye; eger ji bo te ne pirsgirêk be, ji bo min ji binî ne pirsgirêk e.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

Bi Kamîreya Hemza Sêvo



## Jin û destûr



Tu peymaneke civakî taybet a jin di cîhanê de tune ye, her tim li gorî şert û mercan jin bûne beşek ji hevpeymanên civakî. Lê belê yekemîn hevpeymana civakî ya ku bi temamî ji bo jin hatiye pêşinyarkirin û organîzekirin, ew jî bi felsefeya Rêberê gelê Kurd Abdullah Ocalan hatiye pejirandin.**R-2**

## Mitînga Hêvî û Azadî; Herikîna bi sed hezaran ji bo azadiya Rêber Apo ye



Alîkarê Hevserokê Giştî yê DBP'ê Hûseyin Birlik diyar kir ku dewleta Tirk û rayedarên wê dixwazin bê azadiya Rêber Apo vê pêvajoyê bimeşînin, gel û rêveberê vî gelî ji hev cuda bikin, lewma wê Platforma Saziyên Demokratîk di 4'ê Çileyê de li Amedê bi dirûşmeya "Azadiya birêz Ocalan azadiya min e" mîtînga "Hevî û Azadî" li dar bixin.**R-5**


# Ronahî

Şopdara Rastiyê ye

Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1338 | 31-Berfanbar-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S


# PÊWÎSTIYA SÛRIYÊ NE ŞER E, DEMOKRASÎ YE

Ger rejîmeke dijwar li Sûriyê were pêşdebirin, wê pêşeroja hemû gelên Sûriyê tarî bibe. Lê eger hemû gel, bawerî û pêkhate li Sûriyê azad bijîn û sîstemeke demokratîk were damezrandin, wê demê êdî cudahî nema dibe sedema veqetandin û pevçûnan, lê dê bibe çavkaniya dewlemendiyê û reng bidin jiyanê. Di heman demê de wê ji bo Rojhilata Navîn û bi taybet ji bo welatên cîran bibe destkeftiyek.**R-4**





## Xebatên Meclîsa Sûriya Demokratîk a 2025'an



Sala 2025'an nîşan da ku Meclîsa Sûriya Demokartîk MSD'ê ji rêveberiya pevçûnan derbasî çalakiya siyasî ya rêxistinkirî û avakirina hevkariyên neteweyî bûye, ew jî bi rêya aktîvkirina xebatên xwe li ser erdê...**R-10**

## Parastina jîngehê parastina jiyanê ye



Parastina jîngehê yek ji mijara herî girîng e ku mirov li ser bisekine, ji ber ekolojî bi tendirustî û derûniya mirovan ve girêdayî ye. Pêwîst e civak bi taybetî sazî û dezgehên girêdayî civakê parastina çanda jîngehê bikin, da ku bi hev re herêmeke paqij û saxlem ava bikin. **R-8**

## Xebata SZK'ê di sala 2025'an de

Saziya Zimanê Kurdî (SZK) îsal xebateke berbiçav di warê zimên de kir, 9 berhem derxistin, hem jî 102 xelekên bernameyên cuda qeyd kirin, herwiha di vê salê de sê hezar û 294 bawername li xwendekarên astên perwerdeya zimanê Kurdî yên SZK'ê bi sê astên xwe ve hatine belavkirin.**R-9**

## Fêsel Yûsif: Divê demildest lêvegera Kurdî ava bibe



Endamê Desteya Serokatiya ENKS'ê Fêsel Yûsif da zanîn ku astengiya pêşiya şandeyê ew e ku hikumeta veguhêz pêşwaziya şandê nake û lêvegera Kurdî ava nabe û got, "Divê demildest lêvegereke Kurdî ava bibe, ji ber ku ew ê rê li ber xebata şandeyê û çûyîna Şamê veke." **R-6**

## Zext û ambargoya li ser Wargeha berxwedanê Mexmûrê zêde dibe



Li ser Wargeha Penaberan a Şehîd Rustem Cûdî (Mexmûr) zext û ambargo berdewam dikin, armanca vê yekê jî têkbirina vîna berxwedanê ya gelê wargehê ye. Li hemberî ambargo jî gelê wargehê asta berxwedanê bilindtir dike.**R-3**


**Keç têne tecawiz kirin, dayîk bê deng dimîne** — Nehîr pale — R-2

**Lîstika Entegrasyonê û Geşbûna DAIŞ'ê** — Erdogan Altan — R-5


**Hikûmeta veguhêz dawiya xwe nêzîk dike!** — Dilyar Cizîrî — R-6


**Di civakê de pirsgirêka malbatê** — Ehmed Hesen — R-7


**"ji Eremeniyan Sergîs nas dikin"** — Kemal Necim — R-9

# Jin û destûr

**Esma Miştefa**

Destûrên bingehîn ên nûjen jinan weke her ferdekî ji civakê dinasin ku tu ferq û cudatiya wê ji mêr nîne û xalên ji bo parastina mafên wan dihewînin, lê veguherîna ji nivîsê ber bi pêkanînê ve pêvajoyek ku hewldanên yasadanîn û cibcîanînê hewce dike û ji hêla çand û qanûnên serdest ve bandor dibe. Gelek welat hene ku kêm zêde mafê jin di destûran de çawa ku hatiye destnîşankirin di piratîka wê de jî pêk tînin, yanî tenê weke gotineke li ser kaxizê namîne, lê di gelek welatên din de jî ku ew yên zêde ne, mafê jin weke ku hatiye nivîsandin nayê dayîn, ji wan jî Rojhilata Navîn e.
Di Rojhilata Navîn de di sedsala 21'an de yekemîn Hevpeymana Civakî ya Jin tê xêzkirin. Ev hevpeyaman ne tenê nimûneya ji Rojhilata Navîn re, lê belê nimûneya yekemîn di cîhanê de ye ku Hevpeymaneke Civakî bi taybet ji bo hebûna jin di nava civakê de û parastina mafê xwe di hemû aliyan de hatiye pêşkêşkirin. Di hundir vê raporê de me hîn zêdetir ev xal vekirine.

### Rola jinê di destûrên cîhanî de

Di destûrên piraniya welatan de, rola jinê wekî beşek bingehîn a civakê tê naskirin. Destûr ku qanûna herî bilind e, maf û erka jinan di jiyana siyasî, civakî, aborî û çandî de diyar dike. Ev rola bi gelemperî di çend bingehan de tê dîtin:
1. Wekhevî û neferqkirin: Pir destûrên cîhanê destnîşan dikin ku hemû mirov, jin û mêr, li ber qanûnê wekhev in. Ferqkirina li ser bingehê zayendî (jin/mêr) qedexe ye û mafên bingehîn ji bo hemû kesan wekhev têne garantîkirin.
2. Mafên siyasî: Di gelek destûran de, mafên jinan yên siyasî têne pejirandin, mafê dengdanê, mafê xwebijartin û bijartinê û beşdariya di hikumet û parlamentoyê de.
3. Mafên civakî û aborî: Destûr mafê jinan bo xwendin, kar, şertên kar yên wekhev û parastina li dijî tundîtîyê dide destnîşan kirin. Herwiha, mafên dayikatiyê û parastina malbatê di hin destûran de bi taybetî têne qeyd kirin.
4. Parastina li dijî tundîtî û xweparastinê: Hin destûr şertên parastinê ji bo jinan li dijî tundîtîya malbatî, cinsî û civakî destnîşan dikin, û dewlet bi erkdarî dike ku rêbaz û qanûnan derxîne ji bo parastina wan.
5. Cûrbicûrbûna destûran di nav welatan de: Her çend bingehên giştî hene, lê di nav welatan de cudahî heye. Di hin welatan de mafên jinan di destûrê de bi rêz û zelal têne garantîkirin, lê li welatên din hîn jî şert û sînor hene ku li ser rola jinê bandor dikin.
Bi giştî, destûrên cîhanî rola jinê wekî rûmeta mirovî û beşdariya tam a civakê didin naskirin. Lê şert û mercên pêkanîna van mafan li gorî şertên siyasî, çandî û civakî yên her welatê cûda ne.
Hêjayê hevrûkirinê ye ku di vê derbarê de welatên weke Ewropayê û Amerîka Bakur di aliyê pêkanîna destûrî de hinekî xurte û li ser pêkanîna wê muhafezekar e.
Di Rojhilata Navîn de ango dewletên li Rojhilata Navîn piraniya destûrên wan mafê jin tê de hatine destnîşankirin, lê di pêkanîna pratîkî de lawazî heye, û ji welatekî heya ya din tê guhertin.

### Nimûneyên welatên ku mafên jinan di destûrên xwe de bi awayekî xurt garantî dikin

Tevî zehmetiyên ku jin li çar aliyê cîhanê pê re rû bi rû dimînin, hin welatan di warê zelalkirin û bihêztirkirina mafên jinan di destûrên xwe de bi ser ketine, û wekheviya zayendî wekî stûnek bingehîn a edalet û pêşketina civakî dibînin.
Li Ewropayê, welatên wek Swêd, Almanya û Fransa wekî modelên pêşketî têne hesibandin, ji ber ku destûrên wan bi awayekî eşkere wekheviya tam di navbera mêr û jinan de destnîşan dikin. Ew her cure cudakariya li ser bingeha zayendî qedexe dike, û dewlet pabend e ku jinan di warê kar û jiyana siyasî de biparêze.
Li Amerîkayê, Destûra Bingehîn a Kanadayê wekî yek ji destûrên herî piştgirîker ên mafên jinan derdikeve pêş, ji ber ku ew wekheviya tevahî li ber qanûnê garantî dike. Li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, mafên jinan, ji bilî qanûnên federal ên hişk, bi rêya bendên destûrî û guhertinên qanûnî yên piştgir têne parastin.
Li ser asta welatên pêşketî, destûra bingehîn a Afrîqaya Başûr mînakek pêşeng e, ji ber ku ew cudakariya zayendî qedexe dike û parastinek berfireh li dijî tundûtûjiyê peyda dike. Destûra Ruandayê jî ceribandineke ber bi çave ji ber ku beşdariya siyasî ya bêhempa ji bo jinan garantî kir û ew kir piraniya parlamentoyê.
Pisporên mafên mirovan tekez dikin ku hebûna metnên destûrî yên bihêz bi tena serê xwe têrê nake, divê ew bi pêkanînek bibandor û îradeyek siyasî ya rastîn re were. Lêbelê, ev welat hîn jî delîl in ku destûrek dikare bibe amûrek bi bandor di parastina mafên jinan û baştirkirina statuya wan di civakê de. Lê helbet bi derketina Hevpeymaneke Civakî taybet bi jinê, pratîkirin û bihêzkirina rola jin di nava destûrên van welatan de jî, kêm dimîne.

### Çima di Rojhilata Navîn de rola jin di destûrê de paşguhkirî ye

Tevî ku bi dehsalan li ser pejirandina destûrên nûjen re li gelek welatên Rojhilata Navîn re derbas bûne, jin hîn jî bi sînorkirinên eşkere li ser rol û mafên xwe yên destûrî re rû bi rû ne, hem di metnên qanûnî de bi xwe û hem jî di mekanîzmayên pêkanîna wan de li ser erdê. Ev biçûkbûn ne ji ber yek sedemê ye, lê belê encama faktorên siyasî, civakî û çandî yên bi hev ve girêdayî ye. Em dikarin wan jî wiha rave bikin:
Metnên destûrî yên bê cîbicîkirin, Serdestiya çanda zilamperest, Bikaranîna ol di siyasetê de, Adet ji qanûnê bihêztir e, Kêmbûna temsîliyeta jinan di biryardanê de, Şer û bêîstîqrarî.



Xulase; Marjînalîzekirina jinan di destûrên Rojhilata Navîn de ne tenê ji ber nebûna metnan e. Belê, ew ji ber nebûna îradeya siyasî ya ji bo bicîhanîna wê, serdestiya adetan, bikaranîna olê, û beşdariya qels a jinan di rêveberiyê de ye.
Hêzdarkirina jinan a di destûrê de bi reformên rastîn ên qanûnî û guhertinek çandî ya kûr ve girêdayî ye ku wekheviyê dixe cewherê dewlet û civakê.

### Mafê jinê di hilbijartinê de

Di sedsala 19'an û destpêka sedsala 20'an de, mirovan ji bo mafê dengdana jinan dest bi xwepêşandanan kirin. Di sala 1893'an de, Zelanda Nû (New Zealand) bû welatê yekem ku mafê dengdana neteweyî da jinan. Ev tevger li seranserê cîhanê mezin bûye û belav bûye, û îro mafê dengdana jinan mafek e ku di Peymana Têkbirina Hemû Cureyên Cudakariya li dijî Jinan, SEDAW (1979) de hatiye destnîşankirin.
Lêbelê, tevî van pêşketinan, hîn jî gelek cih hene ku bikaranîna vî mafî ji bo jinan pir zehmet e. Nimûne Sûriye; jin bi awayekî bandorker ji beşdarbûna siyasî hatin durxistin, bi taybet di vê pêvajoya nû ya ku diviyabû ber bi guhertineke bingehîn de biherikî bûye, çawa ku hikumeta heyî weke pêvajoya aştiyê pênase dike.
Li Pakistanê, her çend dengdan mafekî destûrî be jî, li hin deveran jin ji dengdanê hatin astengkirin ji ber ku kesayetên bi bandor ên di civakên wan de normên baviksalar ên herêmî bi kar tînin da ku wan nehêlin biçin ser sindoqan.
Li Afganistanê, rayedaran vê dawiyê biryar dan ku li navendên dengdanê sîstemek wênekêşana mecbûrî bikar bînin. Ev yek ji bo jinan di pêvajoya dengdanê de li deverên muhafezekar pirsgirêkek çêkir, ji ber ku piraniya jinan li cihên giştî rûyên xwe vedişêrin.

### Yekemîn Hevpeymana Civakî ya Jin di cîhanê de

Tu peymanekî civakî taybet ya jin di cîhanê de tune ye, her tim li gorî şert û mercan jin bûne beşek ji hevpeymanên civakî. Lê belê yekemîn hevpeymana civakî yak u bi temamî ji bo jin hatiye pişniyarkirin û organîzekirin, ew jî bi felsefeya Rêberê gelê Kurd Abdullah Ocalan hatiye pejirandin. Ev înîsiyatîf li ser vexwendina Rêber Abdullah Ocalan di sala 2001'an de hate destpêkirin, û bang li jinan kir ku peymana xwe ya civakî pêş bixin ku bi peymana civakî ya klasîk re paralel be lê li ser rizgariya jinan bisekine.
Yekemîn civîn di 7'ê Tîrmeha 2024'an de li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi beşdarbûna 130 jinên ji hemû pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê hate lidarxistin, tê de Komîteyek ji 30'î jinî dihat pêk anîn derket da ku reşnivîsa Hevpeymana Civakî ya Jin ku dibe yekemîn hevpeymana civakî ya jin di cîhanê de hate nîqşkirin.
Ji pirtûka (Jin di destûrên cîhanê de) ya bi edîtortiya Eza Kamêl di sala 2012'an de hatiye amadekirin wiha dibêje: "Rola jin di nivîsanidna destûra welat de… Piştî demên veguhêzê de ku tê de destûrên nû têne nivîsandin, derfet ji bo jinan çêdibe ku temsîliyeta xwe di organên qanûndanînê û beşdariya xwe di beşdariya siyasî de zêde bikin. Li Afrîkaya Başûr, jinan karibûn bandorê li nivîsandina destûrê bikin. Di sala 1991'an de, jinên ku ji sirgûnê vegeriyan, jinên karker, û kom û rêxistinên jinan hêzên xwe kirin yek û "Yekgirtina Jinên Neteweyî" ava kirin ku zldetirî sed kom, rêxistinên jinan û nûnerên ji hemî partiyên siyasî yên sereke pêk dihatin.
Vê yekgirtinê "Destûra Jinan" amade kir ku yek ji armancên wê yên sereke ew bû ku di destûrê de wekheviyê pêş bixe û ji bo avakirina "Komîteya Şêwirmendiya Zayendî ya Civakî" di nava dezgeha ku li ser veguhertin û destûra nû nîqaş dike de, zaxtekê ava bike. Di encama vê xebata bêwestan û têkoşîna bênavber a jinan li Afrîqaya Başûr de, destûr mifteyên herî berfireh ên wekheviya destûrî li tevahiya cîhanê hewand.
Bi heman awayî, li Namibyayê (welatekî li rojavayê başûrê Afrîqayê ye) di sala 1989'an de, şeş endamên jin ên Meclîsa Damezrîner bi baldarî û dilsozî xebitîn da ku destûrek pêşverû ji bo welêt amade bikin, destûrek ku cudakariya li ser bingeha zayend, nijad, an ol qedexe dike Her wiha û behsa cudakariya ku jinan di demên berê de kişandiye û hewcedariya rûbirûbûna wê bi çalakiyek biryardar nîşan da."

**Ji Pênûsa Jin**



## Keç têne tecawiz kirin, dayîk bê deng dimîne

**Nehîr Pale**

Di civaka zayendperest de buyerên giran diqewimin ku mejî û exlaqê civakê nikare rabike.
Di civakê de her kes nakeve van rewşan de lê belê kesên ku dikevin van rewşan de kesek hesab ji wan naxwaz e. Eger qanûn hesab nexwaze civak li beramberî van buyeran bêdeng dimîne. Dîsa ya ku tê tewanbarkirin jin e. Mêr destê xwe diavêjê nirxên civakê lê ya tê sucdar kirin jin e.
Dayîka du zarokan piştî hevjînê wê wefat dike bi mêrekî dîtir re dizewicê û her du keçên xwe bi xwe re dibe. Hevjînê wê keça wê ya 9 salî tecawiz dike. Dema em dibihîzin ku temenê wê 9 salî ye em difikirin ku zaroke û mijara dîtir hevjînê dayîka wê ye. Di encamê de heman mêr bi dayîk û keça wê re xew dike. Agahiya dayîkê nîne û keç jî bê deng dimîne. Keç çima bê deng dimîne ji ber ditirse. Fêr nebûye ku li hemberî mêr xwe biparêze û têbikoşe ji ber vê yekê bê bertek dimîne.
Girêdayî vê buyerê mijara ez dixwazim balê bikşînim ser keç li malbatê û dibistanê nayên fêrkirin ku li hemberî êrişên cinsî û piskolojîk xwe biparêz in. Jineke nikarbe xwe biparêze û li benda mêr be wê biparêze wê her tim bibe qurban.
Heman dayîkê nedikarî xwe biparêze ne jî keça xwe ya 9 salî û pênc salî biparêz e. Her keçên wê jî ji aliyê mêran ve hatine tecawiz kirin. Piştî ku hevjînê jinê dimre civak li ser wê ferz dike ku careke dîtir bizewicê û xwe bistirîne. Mêr dikin stara jinê lê yê ew zarokên 9 salî û 5 salî tecawiz kirine mêr in.
Di civaka ku dibêje ez deyndarim, mêr hêz dibînin û li gel wan qîmeta jinê nîne buyerên wisa giran diqewim in. Mêr hesabê civaka xwe nekiriye û ew zarok tecawiz kirine. Dema ku civak buyerê dibihîze tenê bi wî mêr ve didin girêdan û dayîka wan sucdar dikin. Li zîhniyeta xwe, adet û kevneşopiyên xwe venagerin. Eger mêr hêz dibînin û nirx nadin jinê wê her tim buyerên wisa biqewim in. Eger li gorî zihniyeta wan jin li dunyayê û axîretê xizmetkara mêr e, wê demê ne dûre ku rojane jin werin tecawizkirin û kuştin.
Ev buyer li Tebqayê qewimî ye. Piştî ku dayîk diçe gel Mala Jin gazinca mêr dike buyer tê bihîstin û qanûn dikeve dewrê de. Eger Kombûna Jin a Zenûbiya xwedî li wê dayîkê û her du keçên wê derneketibane û hesab nexwestibane wê dîsa jin bûbane qurban. Ji ber li gel civaka zayendperest hebûna jinê tine ye û tu exlaq, adet an qanûn nînin ku jin werin parastin. Ji ber dîn û civaka zayendperest jinan radestî mêran dikin û çarenûsa wan dikeve destê mêr de.
Eger bav û dayîk her tim ji keçên xwe re bibêjin ku hûn mulkê me ne û mulkê hevjînên xwe ne, wê demê maf didin mêran ku her tiştî bi serê jinê bikin.
Di vê buyera li Tebqayê qewimî de destpêkê civaka zayendperest sûcdar e û piştre mêrê ku ew zarok tecawiz kirine sûcdar e.



# Piştî Îsraîlê ew wekî "dewleteke serbixwe" nas kir... Xaka Somalê çi ye?

Serokê Îsraîlê Binyamîn Nîtinyaho 26'ê Kanûnê ragihandin ku ew Xaka Somalê weke dewleteke serbixwe nas dike. Di vê mijarê de gelek bertekên dewletan hatin nîşan dan.

**Diyala Nîdal\Qamişlo**

Serokê xaka Somalê, Abdul Rehman Mihemed Abdullah, di rêya wêneyên ku pêwendiya vîdyoyê ya di navbera wî û serokwezîrê Îsraîlê Binjemîn Nitinyaho de belav biribû, ku tê de biryara Îsraîlê bi naskirina Xaka Somalê weke dewleteke serbixwe û serwer, raghand.

### Hinek agahî li ser vê herêmê

Xaka Somal û paytexta wê Hargeisa dikeve aliyê bakur-rojavayê Somal, rûbera wê dighêje 175 hezar k.m çar goşe ye, li ser sînorê başûr-rojava Etiyopyayê ye, Cîbotî jî ji hêla bakur-rojava, Kendava Edenê ji aliyê bakur û ji hêla rojhilat Wîlayeta Bontlanda Somalî ye. Hejimara niştecihê wê zêdetirî 6 milyonî ye.
Ev herêm xwedî xetên peravê yên 740 k.m li kêleka Kendava Edenê ye û li cihê hevdîtina Okyanûsa Hindî û Deryaya Sor li Qerin Efrîqayê cihekî stratejîk digire. Bi salan e ku bendera stratejîk a Berberayê xaleke girîng a şerên desthilatdariyê yên herêmî û navneteweyî li Qerin Afrîqayê bûye.
Di sala 1991'an de, nêzîkî sê meh piştî hilweşîna hikûmeta navendî ya Somalê, piştî hilweşandina Serokkomarê berê yê Somalê Mohamed Siad Barre, bi awayekî yekalî serxwebûna xwe ji Somalê raghand. Lêbelê, ji aliyê civaka navneteweyî ve nehatiye naskirin.
Referandûma yekem: Di Tebaxa 2000'an de, hikûmeta herêmî pêşnûmeyên pêşniyara destûrê pêşkêş kir ku veqetandina dawî ji Somalê destnîşan dikir. Di 31'ê Gulana 2001'an de li ser vê yekê referandûmek hate lidarxistin û ji sedî 97.1'ê deng dan erê kirin. Di sala 2016'an de, derbasbûna 25 salan li ser wê gavê pîroz kir.
Danûstandinên giring: Rayedarên Meqdîşo û Hargeîsayê danûstandin di sala 2012'an de dest pê kirin û yên herî dawî di sala 2020 û 2023'an de bêyî rêkeftinekê berdewam kirin, lidar xistin.
Xaka Somalê xwediyê pereyê xwe taybet e, herwiha artêş û hêzên polîsê yên girêdayî wê. Xaka Solamê tevî cihê wê yê stratejîk li perava başûr a Kendava Edenê, ku yek ji rêyên bazirganiyê yên herî çalak ên cîhanê ye û li ber deriyê Tengava Bab El-Mendeb e ku ber bi Deryaya Sor û Kanala Siwês ve diçe, êşê ji tecrîd û xizaniyê dikişîne.
Nifûsa wê bi qasî 3.5 milyon e li gorî texmînkirinên sala 2017'an de, yên nû tê texmînkirin ku di navbera 5.7 û 6 milyon de ne.
Pêkhateya civakî ji sê eşîrên sereke pêk tê: Eşîra Îshaq li herêma navendî, ku ya herî mezin e û piraniya hêza siyasî di destê wê de ye, eşîra Dêr li herêma rojava û eşîra Darod li herêma rojhilat.
Şeş herêmên îdarî hene: Wokwe Galbeed, Tajdir, Sool, Sanaag, Awdal û Sahil. Pereyê wê yê neteweyî Şiling e û zimanên wê Somalî, Erebî û Îngilîzî ne.
Sîstema wê ya siyasî komarî ye, xwedî serokkomar, hikûmet, Meclisa Nûneran (odeya yekem) û Senato (odeya duyem) hene, her yek bi 82 endaman.
Aloziyên girîng: Di destpêka sala 2024'an de, Etiyopya û Xaka Somalê peymanek îmze kirin ku rê da Addis Ababa ya ku derya lê tune ye, li dora bendera Berbera, 20 kîlometre xeta peravê kirê bike û di berdêla naskirina Xaka Somalê de ji bo 50 salan gihîştina Deryaya Sor ji bo armancên deryayî û bazirganî peyda bike. Ev peyman ji aliyê Meqdîşo û Lîga Ereban ve hate redkirin. Di dawiya Tebaxê de, Etiyopya nûnerekî nû bi pileya balyoztiyê şand Xaka Somalê, ev yekem tayînkirina wiha ye ji dema avakirina têkiliyan di navbera Addis Ababa û herêmê de.

### Naskirina wê ji hêla Îsraîl

Serokê dewleta Îsraîlê Binjemîn Nitinyaho di 26'ê Kanûnê de ragihandin ku ew xaka Somalê weke dewleteke serbixwe nas dike. Herwiha Serokê Îsraîlê diyar kir ku ew hevkariya xwe bi Xaka Somal re di aliyê aborî, teknolojî, çandinî û tenduristiyê de xurttir dikin.

### Redkirina Ereban

Piştî biryara serokê Îsraîlê ya naskirina Xaka Somalê, ji aliyê dewletên ereb û Îslamî mîna Erebistana Siûdî û Sûdan daxuyaniyê şermezarkirinê hatin dayîn û di daxuyaniyên xwe de diyar kirin ku ew naskirina Xaka Somalê ji aliyê dewleta Îsraîl ve red dikin. Di heman demê de dewleta




Qeterê jî naskirina hevbeş a di navbera Îsraîl û Xaka Somal de redkir. Wezareta karên derve ya Qeterê di daxuyaniya xwe de piştrastkir ku ev biryara ku ji aliyê Îsraîl ve hatiye xeternake û tê wateya ji hev parçekirina axa Somal e.
Ji hêla xwe ve Serokê Xaka Somaliyê raghandin ku piştî zêdetirî 30 salan ji xwe xwerêveberiyê, herêmê yekem naskirina fermî wekî dewletek serbixwe û serwer wergirtiye.

### Tedbîrên hikumeta Federal ya Somalê

Li gorî daxuyaniyek ji ofîsa Serokwezîrê Somalê, Hikûmeta Federal a Somaliyê şiyanên xwe yên dîplomatîk seferber kiriye da ku piştgiriya navneteweyî û herêmî kom bike û vê gavê ku prensîbên hiqûqa navneteweyî, Peymana Neteweyên Yekbûyî û Statuya Yekîtiya Efrîqayê binpê dike, red bike.
Serokkomarê Somaliyê Hesen Şêx Mihemed ji bo yekgirtina rêzên welêt dixebite, li hember naskirina hin beşên Somalê wekî "serbixwe" ji aliyê Îsraîlê ve.
Di hevpeyvîneke taybet de ligel "Al Jazeera Net", Wezîrê Dewlemendî û Aboriya Şîn Ehmed Hesen ev gav wekî destwerdaneke dijminatî ya eşkere di karûbarên navxweyî yên dewletek serwer de ji hêla hebûnek ku bi tunebûnê re rû bi rû ye, di heman demê de hewldanek ji bo ferzkirina rastiyek siyasî ya nepejirandî ye, ku ji hêla hebûnek ve tê rêvebirin ku rewatiya wê ya exlaqî û qanûnî tune ye û bi parçekirina welatan ji hundir ve li Qern Efrîqayê li cihekî digere û ev yek dê çênebe, nirxand.

### Bandora naskirinê

Wezîr îdia dike ku ev naskirin bandorên xwe li ser ewlehiya neteweyî ya Somalê dike, ji ber ku ew derî li ber binpêkirinek cidî ya ewlehî û îstîxbaratê vedike, ewlehiya Deryaya Sor û Kendava Edenê tehdît dike û hewldanên dijî-terorê tevlihev dike. Destnîşan kir ku ev yek wekî bûyerek sembolîk nabînin, lê belê wekî gefek stratejîk li ser ewlehiya Ereb û Efrîqayê dibînin.
Analîstên herêmî bawer dikin ku nêzîkbûna bi Somalê re dikare rê bide Îsraîlê ku gihîştina xwe ya Deryaya Sor misoger bike.
Xaka Somal nêzîkî 10 salan e ku li dijî rêxistina ciwanan ku girêdayî El Qaîdeyê ne, şer dike. Tevî başbûneke berbiçav ku di rewşa ewlehiyê ya li paytextê de, lê belê şer tenê 60 k.m dûrî wê berdewam e.

### Berjewendiyên Îsraîlê bi naskirina Xaka Somalê

Hineke Analîst destnîşan dikin ku gava Îsraîlê bi stratejiyeke kevin ve girêdayî ye, ji ber ku Îsraîl ji salên 1950 û 1960'an vir ve bi herêma Qerin Afrîqayê re eleqedar e. Nivîskar û analîstê siyasî yê pispor di karûbarên Efrîqayê de Ebdul Qadir Mihemed Elî, rave dike ku Îsraîlê ev stratejî di salên dawî de, bi taybetî di navbera 2010 û 2011'an de, ji nû ve vejandiye.
Li gorî Mihemed Elî, piştî zêdebûna tevgerên berxwedanê li Xezayê, başûrê Lubnanê û ji ber bandorên Bihara Ereban, her wiha derketina holê ya rola Tirkiyê li herêmê, Îsraîl dîsa bala xwe daye Qerin Efrîqayê.
Sedemeke din a ku Îsraîlê Xaka Somalê nas kir ji ber cihê stratejîk ê vê herêmê ye, ji ber ku ew li ser Kendava Edenê û Tengava Bab el-Mendebê ye, ku ev yek dê bihêle Til Ebîb li ser koma Hûsîyan ya li Yemenê sîxurî bike û çavdêriya navîgasyonê li wê herêmê bike, li gorî Nivîskar û analîstê siyasî yê pispor di karûbarên Efrîqayê de Ebdul Qadir Mihemed Elî.

### Xaka Somaliyê û Filistînî

Daxuyaniyeke Îsraîlê di Sibata borî de, cara yekem îhtîmala naskirina herêma Xaka Somaliyê ji aliyê Emerîkayê ve bi qebûlkirina "koçberkirina" Filistîniyan ji bo wê herêmê ve girêda û hişyariyeke fermî ji Meqdîşûyê li ser encamên wê naskirinê û nebûna îhtîmala qewimîna wê da.

### Bargeheke Emerîkî li derdora Berberayê

Derketina holê ya medyaya Emerîkî ya derbarê danûstandinên di navbera Washington û Xaka Somalê de di meha Adarê de, li ser pêşniyara avakirina baregeheke leşkerî ya Emerîkî li nêzîkî bajarê peravê Berbera yê giring ê stratejîk, di medyaya Somalî de deng veda. Rojnameya Brîtanî Financial Times ji rayedarekî payebilind ê Emerîkî vegot ku rêveberiya Trump bi rêveberiya Xaka Somalê re derbarê naskirina fermî de dest bi danûstandinan kiriye.

# Xebatên Meclîsa Sûriya Demokratîk a 2025'an

**Sala 2025'an nîşan da ku Meclîsa Sûriya Demokartîk MSD'ê ji rêveberiya pevçûnan derbasî çalakiya siyasî ya rêxistinkirî û avakirina hevkariyên neteweyî bûye, ew jî bi rêya aktîvkirina xebatên xwe li ser erdê. MSD'ê hewl da ku xwe wekî stûnek siyasî ya sereke ya projeya Sûriya demokratîk a li ser bingehê nenavendî, pirrengî û hemwelatîbûna wekhev, ava bike.**

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

### Piştî hilweşîna rejîma Sûriyê

Sala 2025'an, sala yekem piştî hilweşîna rejîma Baas a Sûriyê bû. Vê yekê qonaxek girîng di dîroka Sûriyê ya nûjen de nîşan da ku bi aloziyên siyasî, ewlehî û civakî yên bêhempa û hewldanên cidî ji bo ji nû ve şekildana dewleta Sûriyê û siberoja wê ve, hate diyarkirin. Di vê çarçoveya veguhêz a hesas de, Meclîsa Sûriya Demokratîk wekî aktorek siyasî ya neteweyî derket holê, helwestên xwe yên zelal, çalakiyên xwe yên dîplomatîk û xebata xwe ya rêxistinî ya navxweyî nîşan da. Wê hewl da ku projeya xwe ya li ser bingeha demokrasî, nenavendî, hemwelatîbûna wekhev û pirrengiyê xurt bike.

### Di vê salê de, Meclîsê li ser rêyên hevseng xebitî

Ji hêla siyasî ve, ji bo rêxistinkirina helwesta neteweyî. Ji hêla dîplomatîk ve, ji bo zêdekirina rewatiya xwe wekî hevkar di her çareseriyek siberojê de.
Ji hêla rêxistinî ve, ji bo avakirina saziyên ku dikarin berdewam bikin û bi bandor bin.

### Yekem: Helwest û daxuyaniyên fermî

Meclîsa Sûriya Demokratîk berdewam kir bi weşandina daxuyanî û helwestên siyasî yên ku prensîbên wê yên neteweyî diyar dikin, ji wan jî yên herî berbiçav ev bûn:

-Ewlehî û aramî

Meclîsê hemû kiryarên terorîstî yên ku ewlehî û aramiya Sûriyê hedef digirin, tevî êrişa terorîstî ya ku hêzên Amerîkî li Tedmûrê hedef girt, şermezar kir û tekez kir ku teror gefek rasterast li ser her pêvajoyeke siyasî ya Sûriyê çêdike.

### -Bîrdanka niştîmanî û nasnameyê

Meclîsê girîngiyeke taybet da bîranîna kêliyên girîng ên di dîroka têkoşîna Sûriyê ya li dijî teror û zordariyê de. Wekî rizgarkirina bajarê Reqayê ji çeteyên DAIŞ'ê, berxwedana Koban û salvegera damezrandina Rêveberiya Xweser a Demokratîk bi bîr anî. Herwiha dagirkirina berdewam a Serêkaniyê û Girê Spî şermezar kir û ev yek wekî binpêkirina serweriya Sûriyê û mafên niştecihên wê, bi nav kir.

### - Pirrengiya olî û civakî

Meclîsa Sûriya Demokratîk pabendbûna xwe ya bi Sûriyeke piralî re piştrast kir. Herwiha beşdarî çalakiyên olî û civakî yên ji bo pêkhateyên cûda, bû. Herwiha ew dibîne rêzgirtina ji pirrengiyê re, kevirê bingehîn ê avakirina dewleteke hemwelatîbûnê ye.

### - Mafên mirovan û jinan

Meclîsa Sûriya Demokratîk redkirina tundûtîjî û binpêkirinan, nemaze tundûtîjiya li dijî jinan dubare kir û tawanên li dijî sivîlan û cihên îbadetê şermezar kir. Di heman demê de tekez kir ku edaleta veguhêz û rêzgirtina mafan, şertên bingehîn ên ji bo aramiyê ne.

### - Pêvajoya siyasî û qonaxa veguhestinê

Meclîsa Sûriya Demokratîk rexne li mekanîzmayên avakirina hikumeta nû kir û diyar kir ku ne li ser bingeha hevkariyeke rastîn a neteweyî ne. Herwiha daxwaza bidawîanîna cezayên berfireh ên ku gelê Sûriyê zirar jê dibînin, kir. Hem jî meclîsê daxwaza destpêkirina diyalogeke neteweyî ya berfireh bê cudahî kir.

### Duyem: Çalakiyên hevserokatiyê û desteya hevserokatiyê

Hevserokatiya Meclîsa Sûriya Demokartîk di sala 2025'an de roleke girîng lîst, nemaze piştî guhertina siyasî ya ber bi Şamê ve. Ji ber ku hevdîtinên xwe bi hêz û kesayetên siyasî yên neteweyî, nûnerên tevgerên sivîl û civakî re, zêde kir.

### Hevserokatiyê di xîtaba xwe de bal kişand li ser van mijaran:

- Pêwîstiya veguhestina nîqaşa siyasî bo qada neteweyî ya Sûriyê.
- Redkirina çareseriyên dûrxistinê yan jî yên ji derve hatine ferzkirin.
- Tekezkirina li ser nenavendîbûnê, destûreke demokratîk û edaleta veguhêz.

Di heman demê de hevserokatiyê kar û xebatê ofîsan şopand, herwiha temsîlkirina meclîsê di hevdîtin neteweyî û navneteweyî de û kontrolkirina gotûbêjên siyasî yên giştî de, roleke sereke lîst.

### Sêyem: Tevlîbûna hevpeymaniya hemwelatîbûna Wekhev "Hevgirtî"

Wekî beşek ji berfirehkirina hevpeymaniyên neteweyî, Meclîsa Sûriya Demokratîk piştî hilweşîna rejîmê Baasê, li ser bingeha baweriya xwe ya bi pêwîstiya yekkirina hewildanên hêzên demokratîk li ser bernameyek neteweyî ya berfireh, tevlîbûna xwe ya di Hevpeymaniya Hemwelatîbûna Wekhev "Hevgirtî" de, ragihand.

### Meclîsê bi awayekî çalak beşdarî civîn û nîqaşên Hevpeymaniyê li ser van mijaran bû:

- Qonaxa veguhêz.
- Awayê dewleta Sûriyê.
- Destûr û hemwelatîbûna wekhev.

Bi berdewamî tekezî li ser zelaliya prensîban û rêzgirtina ji bo xweseriya her alî, kir.

### Çaremîn: Xebata dîplomatîk û têkiliyên derve

Meclîsê, ji bilî beşdarbûna di civînên herêmî û navneteweyî de, bi rêya nûnerên xwe yên li Ewropa, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, Brîtanya û welatên Ereb çalakiyên xwe yên derve domand. Di nav de, hevdîtinên bi rayedarên hikumet û parlementoyê re, beşdarbûna di konferansên li ser mafên mirovan, demokrasiyê û veguheztina siyasî de. Diyalogên bi civakên Sûrî û Kurd ên li derveyî welêt re. Ev yek jî bi armanca ravekirina vîzyona meclîsê û komkirina piştgiriya navneteweyî ji bo çareseriyek demokratîk li Sûriyê.

### Pêncemîn: Karê nivîsgehan

Avakirina saziyan û veguherîna bo çalakiya siyasî ya rêxistinkirî Sala 2025'an di kar û xebatên ofîsên Meclîsa Sûriya Demokratîk de guhertineke berbiçav a kalîteyî, hat dîtin.
- Ofîsa Têkilî û Hevpeymanan: Tora xwe ya ragihandinê bi partî, hêz û rêxistinan re berfireh kir.
- Civaka sivîl, semînerên siyasî yên hevbeş lidar xistin.
- Ofîsên lêkolîn û siyasetê, kaxezên analîzî li ser nenavendîkirin, destûr û peymanê amade kirin.
10'ê Adarê bû xalek lêvegerê ji bo nîqaşên siyasî.
- Ofîsa Jin: Forum û komxebat lidar xistin û di qonaxa veguhêz de ji bo pirsgirêkên jinan parêzvanî kirin.
- Ofîsa Ciwanan: Meclîsa Giştî ya Ciwanên Sûriya Demokratîk damezrand û beşdariya siyasî xurt kir.
Ji bo ciwanan, Ofîsa Ragihandinê, gotûbêjên ragihandinê û çalakî birêxistin kirin, herwiha komxebat derbarê xebatên ragihandinê de lidar xist.

### Şeşem: Çalakiyên navxweyî û raporên ji kanton û parêzgehan

Meclîs xwe dispêre raporên asayî yên kantona Cizîrê, Reqa, Dêrezor, Kobanî, Hesekê, parzgeha Şam û Helebê, Berav, Deraa, Siwêda, Hums û Hemayê ku rastiyên siyasî û civakî yên li ser erdê nîşan didin.
Hevdîtinên giştî hatin organîzekirin, herwiha civîn bi serok eşîran, kesayetên olî û rewşenbîran re hatin lidarxistin. Di heman demê serdan ji bo kesên koçber ên ji Efrînê, Serêkaniyê û Girê Spî re, hatin kirin. Van raporan alîkarî kirin ku helwestên meclîsê li gorî hewcedariyên civakê werin destnîşankirin.

### MSD'ê sala 2025'an derbasî çalakiya siyasî ya rêxistinkirî bûye

Sala 2025'an nîşan da ku Meclîsa Sûriya Demokartîk MSD'ê ji rêveberiya pevçûnan derbasî çalakiya siyasî ya rêxistinkirî û avakirina hevkariyên neteweyî bûye. Bi rêya aktîvkirina ofîsên xwe, hebûna hevserokatiya xwe, tevlîbûna wê di hevpeymaniya hevgirtî, hewldanên dîplomatîk û xebatên li ser erdê. MSD'ê hewl da ku xwe wekî stûnek siyasî ya sereke ya projeya Sûriya demokratîk a li ser bingehê nenavendî, pirrengî û hemwelatîbûna wekhev, ava bike.



# Zext û ambargoya li ser Wargeha berxwedanê Mexmûrê zêde dibe

**Li ser Wargeha Penaberan a Şehîd Rustem Cûdî (Mexmûr) zext û ambargo berdewam dikin, armanca vê yekê jî têkbirina vîna berxwedanê a gelê wargehê ye. Li hemberî ambargo jî gelê wargehê asta berxwedanê bilindtir dike.**

**Viyan Egîd/Qamişlo**

Şêniyên Wargeha Penaberan a Şehîd Rustem Cûdî (Mexmûr) ku ji aliyê Neteweyên Yekbûyî ve weke Penaberên siyasî hatî pejirandin, zêdeyî 30 sal in bi zilm û zordariya dewleta Tirk, PDK û niha jî bi ya Iraqê rû bi rû ne. Ji hemû mafên xwe yên rewa yên penabertiyê bê par mane. Li wargeha Mexmûrê nêzî 12 hezar welatiyên ji Bakurê Kurdistanê hene, şêniyên wargehê piştî rêyek gelek dirêj a tije êriş, zehmetî û êşên jiyanê, li Mexmûrê bicih bûne. Ji sala 1994'an ve bi rêzê li wargehên Bihêrê, Şeraniş, Bêrsîvê, Geliyê Qiyametê, Etrûş, Nînova û Nehdaran mane. Di van wargehan de ji bilî êşên mezin ên jiyanê ku gelek zarok, pîr û jinan jiyana xwe ji dest dan, panaber bi gelek êrişan re jî rû bi rû man.
Wargeha Mexmûrê piştî dorpêça PDK'ê, vê carê bi dorpêçek Iraqê re rûbirûye. Iraq ji 10'ê Nîsanê ve rê nade kel û pel bikevin nava wargeha Mexmûrê, rê nade karker biçin ser karên xwe û nasnameyên xelkê wargeha Mexmûrê nû nakin. Wargeha Mexmûrê piştî dorpêça PDK'ê, vê carê bi dorpêçek din ya Iraqê re rûbirûye. Di 17'ê Tîrmeha 2019'an de PDK'ê li ser daxwaza dewleta Tirk a dagirker rêgirî û ambargoyek ku hîna didome danî li ser Wargeha Penaberan a Şehîd Rustem Cûdî (Mexmûr). Ji ber rêgiriyê, bi dehan nexweşên rewşa wan giran e, nekarîn biçin Hewlêrê. Rojek piştî wê ango di 18'ê Tîrmeha 2019'an de balafirên şer ên artêşa dewleta Tirk a dagirker, wargehe bombebaran kirin. Di encama bombebaranê de 2 şêniyên wargehê birîndar bûn.

### Xwestin têl bikin

Di heman demê de tevî êrişan xwestin, wargehê têl bikin û nehêlin kes ji wargehê derkeve. Di 27'ê Kanûna 2021'an de Hêzên Iraqê ji nişka ve serê sibê xwestin bikevin wargeha penaberan ya Şehîd Rûstem Cûdî (Mexmûr). Hêzên Iraqê xwestin derdora hemû wargehê têl bikin û bixin dorpêçê. Lê xelkê Mexmûrê li hemberî vê rawestiya û ne hştin ku Iraq derdora wargehê têl bike. Ev jî tê xuyakirin ku dewleta Tirk vê yekê dike, dixwaze gelê Mexmûrê bi dorpêçê bide fetsandin. Bêguman li hemberî van kiryaran gelê wargiha Mexmûrê îrade û berxwedaniya xwe derxistin holê, ev dorpêç wan nade şikandin. Roj bi roj asta têkoşînê bilintir dikin.

### Iraqê zext û gefên xwe yên li ser wargeha Mexmûrê zêdekiriye

Carek din di 20'ê Gulana 2023'yan de heman hewldan û siyaset ji aliyê hikûmeta Iraqê ve beramberî xelkê Mexmûrê hate pêkanîn, xwestin derdora wargehê xendekan bikolin, têl bikin û bircan danin. Lê di encama berxwedana 16 rojan ya Mexmûrê de ev hewldan û plan hate têkbirin. Berxwedana xelkê Mexmûrê rê li hewldanên bi daxwaza dewleta Tirk û PDK'ê dihat kirin, girt. Wargeha Mexmûrê dibin sêwana Neteweyên Yekbûyî deye, lê NY tevî hemû êrişên ser wargehê jî bêdenge. Niha Iraqê zext û gefên xwe yên li ser Wargehê zêdekiriye û li dijî xelkê wargehê ketiye nava liv û tevgerê.




### Ji 10'ê Nîsanê ve rê girtîne

Iraq ji 10'ê Nîsana 2025'an ve nahêle ti kel û pelên avahîsaziyê bikevin nava wargehê, rê nade karker biçin bajarên Iraqê kar bikin û nasnameyên xelkê wargehê jî nû nakin.
Ji bo çareserkirina van pirsgirêkan gelek caran komîte û meclîsên Wargeha Mexmûrê serî li rayedar û aliyên peywendîdar ên Iraqê dane. Bi caran daxwazên wan bê bersiv hatine hêlan. Ji bo raberkirina helwest û îradeya xwe, xelkê Mexmûrê di 30'ê Nîsanê de li dijî zext û ambargoya Iraqê ya li ser wargehê, meşek girseyî lidarxistin. Xelkê wargehê li ber xala kontirolê ya hêzên Iraqê çalakiya rûniştinê dane destpêkirin. Li wir daxuyaniyek ji raya giştî re hate dayîn. Piştî daxuyaniyê rêveberiya wargehê bi rayedarên Iraqê re hevdîtinek kurt kirin. Rayedarên Iraqê ragihandin ku wê şandeyek roja piştî wê were wargehê li ser van mijarên heyî hevdîtinekê pêkbînin. Xelkê wargehê jî diyar kirin ku ger ev şande neyên wê çalakiyên xwe berdewam bikin.

### Mexmûrê dike nava bazariyê

Hevdîtinên Iraq û Tirkiyê çêdibin, ji dewleta Tirk dixwazin ku pirsgirêka avê çareser bike. Herwiha Iraq ji Tirkiyê dixwaze baregehên xwe yên leşkerî derbixe û êdî balafirên xwe ser Iraqê nefirîne. Lê Tirkiye vê qebûl nake û divê mijarê de Mexmûrê dixe nava bazariyê.

### Berxwedanî

Gelê wargeha Mexmûrê ji mezinan heta biçûkan, ji jin, dayik û ciwanan bigre heya kal û pîrên 90 salî bi hêz û îradeya berxwedana 30 salan li hemberî artêşa Iraq, çek û makîneyên zirxî bê tirs rawestiyan. Car caran bi dirûşmên xwe, carna bi stran, tilîlî, govendên xwe û carna jî bi kevirên xwe li hemberî êrişên hikumeta Iraqê rawestiyan. Bi taybet jî jin, zarok û ciwanên wargehê. Di destê wan de tenê berxwedanî hebû. Jinên wargehê mohra xwe li vê berxwedanê dan. Sekna xwe ya berxwedêr nîşanî hikumeta Iraqê dan. Bi destên xwe yên ku bi qasî 30 salan e hemû ked û berxwedana wargeha Mexmûrê di wan de diyar dibin, xendekên ku hikumeta Iraqê kolane bi axê dagirtin. Ev berxwedanî bû mînak ji hemû cîhanê re û bû sedem ku hikumeta Iraqê xwe paşve bikşîne. Wargeha Mexmûrê careke din bi berxwedaniya xwe navê xwe li rûpelên dîrokê nivîsand.

### Li gorî vê daxwazên gelê wargiha Mexmûrê evin:

1. Nasname di demek nêz de werine nûkirin.
2. Derfet ji bo xwendinê were avakirin û deriyên zaningehê ji xwendevanan re were vekirin.
3. Weke her penaberekî li Iraqê sotemeniya zivistanê were dayîn.
4. Astengiyên di çûyîn û hatina de û di ketina wargehê de were rakirin.
5. Rê were dayîn, bi navê wargehê şandeyek bi Wezareta Navxweyî re hevdîtin pêk were."

Meş bi dirûşmeyên 'Bijî Serok Apo', 'Bê Serok Jiyan Nabe' û 'Bijî Berxwedana Mexmûrê' bi dawî bû.

# Li Îranê têkçûna aboriyê û xwepêşandanên gel

**Zana Roj**

**Li Rojhilatê Kurdistan û Îranê li dijî rewşa nebaş ya aborî, gendelî, cezayên darvekirinê û ji bo bicihanîna daxwazên xwe, karmend, mamoste, xanenîş û çalakvanên siyasî daketin qadan û li ber derê gelek navendên dewletê yên bajaran kom bûn.**

### Xwepêşandanên gel li Rojhilatê Kurdistanê û Îranê

Hikumeta Îranê xwedî siyasetekî welê ye ku tu derfetên jiyanê ji gelê xwe re ava nake ye. Ev yek ji siyaseta xwe ya navxweyî ku bi zihniyeta olperest, zayendperest û nijadperest tê meşandin, her wiha ji mudexeleyên xwe yên leşkerî û destwerdanê ji welatên din re derdikeve. Di encama van nêzîkatiyan de yê ku dibe qurban û li ser wan ceza tên ferizkirin ne hikumete, gel e. Di çend rojên derbasbûyî gelê Rojhilatê Kurdistanê û Îranê li hember rewşa aborî ya pir zehet ku bandora xwe li ser jiyana gel kiriye, he rwiha pê ve girêdayî li hember siyaseta darvekirinê, bi hezaran gel li qadan bi xwepêşandanan nerazîbûna xwe nîşan dan.
Li gorî agahî û dîmenên di torên civakî de hatine parvekirin, li gelek bajarên Rojhilatê Kurdistan û Îranê karmend, mamosta, xanenîş û karker daketine kolanan.
Tê gotin li gelek bajaran xelk li ber derê avahiyên walitiyan kombûne û dijî rewşa nebaş ya aborî, gendelî, cezayên darvekirinê û ji bo bicihanîna daxwazên xwe, kom bûne.
Di çalakiyan de xelk dijî hikumeta Îranê dirûşme diqêrin û karmendan xwestin mûçeyê wan were pêşwazîkirin. Herwiha welatiyan xwest rêjîm dawî li darvekirinan bîne.

### Li Îranê rewşek çawa tê jiyankirin.

Di sê rojên derbasbûyî de li gelek deverên bazar û navendên paytexta Îranê, Tehranê, xwepêşandan pêk hatin û xwepêşanderan li dijî rewşa aborî û şert û mercên jiyanê yên li welêt dirûşme qîr kirin.
Di heman demê de, bazar û dikanên Tehranê yên li navçeya Lalezzar a başûr ji ber bilindbûna berbiçav a bihayên diravên biyanî û zêr hatin girtin.

### Enflasyon û bihayên bilind

Ev xwepêşandan di demekê de hatin ku nirxa dolar di bazara azad a diravî ya Îranê de roja Yekşemê gihîşt zêdetirî 144,000 tumenî. Di heman demê de, Navenda Amarên Îranê ragihand ku rêjeya enflasyonê ya salane ya meha Kanûnê ji %52 derbas bûye.
Bazara dirav û zêr a Îranê duh gihîşt asta herî bilind a nû. Dolar ji 144 hezar tomenî zêdetir, euro ji 169 hezar tomenî zêdetir û lîreya Brîtanî jî ji nêzîkî 194 hezar tomenî zêdetir derket.
Bi giştî, kêmasiya budceyê, enflasyona bilind, kêmbûna pereyên biyanî û têkçûna ji nû ve destpêkirina danûstandinên nukleerî bi Dewletên Yekbûyî re ji bo rakirina dorpêçan,



perspektîfa aborî tarî kiriye û kontrolkirina bihayan dijwartir kiriye.

### Sedemên siyasî yên derxistina van qeyranan di Îrandê de

Rojnameya New York Times ragihand ku Serokê Amerîkayê Donald Trump û Serokwezîrê Îsraîlê Benjamin Netanyahu di civîna xwe ya li havîngeha Mar-a-Lago li Florîdayê de eniyeke yekgirtî pêşkêş kirin, û bi eşkereyî nakokiyên xwe yên li ser Xezeyê, Sûriyê û pirsgirêkên din ên herêmî paşguh kirin.
Li gorî rojnameyê, her du rêberan ji nîqaşkirina hûrguliyên qonaxa din a plana Xezeyê ku tê de bêçekkirina Hamasê, vekişîna qismî ya Îsraîlê û bicihkirina hêzek navneteweyî heye, dûr ketine û xwe bi pesindana siyasî ve sînordar kirine. Lêbelê, Trump pabendbûnek zelal ragihand ku dê piştgirîya her êrişek potansiyel a Îsraîlê li dijî Îranê bike ger Îran bernameyên xwe yên nukleerî û mûşekî bidomîne.

# Çima Çiyayê Colanê ne di nexşeya Sûriyê de ye?

Di nexşeya Sûriyê ya nû de ku ji aliyê Wezareta Derve ya Sûriyê ya ku beşek ji hikumeta veguhêz e hatibû weşandin, tê de Çiyayên Colanê cih negirtiye, bi vê yekê hikumeta veguhêz dide diyarkirin ku ew daxwaza Colanê nake, herwiha ew ji bo desthilatdariya xwe dikare Sûriyê giştî bide ber bazarê.

**Ronahî Sadûn**

### Colan

Çiyayên Colanê ku çiyayek li Şamê ye, di navbera Çemê Yermûk li başûr û Çiyayê Hermon li bakur de ye. Ji hêla rêveberî ve beşek ji Parêzgeha Quneytrayê ye û ew beşek ji Sûriyê ye. Di şerê sala 1967'an de, artêşa Îsraîlê du ji sêyan ji wê dagir kir. Ji wê demê ve
Neteweyên Yekbûyî wê wekî axa Sûriyê ya dagirkirî dihesibîne.

### Colan bi çavkaniyên av û axê berhemdar e


Çiyayên Colanê bilindahiyeke istratejîk e li başûrê rojavayê Sûriyê. Ew herêmeke çiyayî ye ku dewlemend bi çavkaniyên avê û axa berhemdar. Di heman demê de xwedî girîngiyeke leşkerî û aborî ya mezin e. Ew li ser Îsraîl, Sûrî û Lubnanê ye. Herwiha çavkaniyên Çemê Urdunê û Gola Teberiya kontrol dike.
Çiyayên Golanê şahidê du ji şerên herî mezin ên Ereban Yermûk û Hetîn kiriye. Di seranserê dîrokê de jî ji ber cihê xwe yê istratejîk, erdnîgariya xwe ya bêhempa, dewlemendiya aborî û çavkaniyên avê, sînorê wê hatiye guhertin. Li ser axa wê wargeh hatin avakirin ku ji bo Îsraîlê kûrahiyek berhemdar, depokirinên xwarin û avê, herwiha herêmek parastinê ya girîng pêk anîn.

### Colan ji sedî yek rûbera giştî ya Sûriyê pêk tîne

Çiyayên Colan wekî Sûriyê jî tê zanîn, ew li Başûr-Rojavayê Komara Sûriyê, Başûr-Rojhilatê Libnanê, Bakur-Rojhilatê Filistînê û Bakur-Rojavayê Urdunê ye. Rûbera giştî ya Çiyayên Golanê 1860 kîlometre çargoşe ye ku ev jî sedî 1'ê rûbera giştî ya Sûriyê pêk tîne. Îsraîlê di şerê Hezîrana 1967'an de nêzîkî 1250 kîlometre çargoşe ji wê dagir kir û piştî şerê Cotmeha 1973'an Sûriyê 100 kîlometreçargoşe ji wê vegerand. Îsraîl niha nêzîkî 1,176 kîlometre çargoşe ji Çiyayên Colanê dagir kiriye, di nav de 100 kîlometre çargoşe ji herêma bê çek a ku di bin Peymana Agirbestê ya 1949'an de hatiye damezrandin. Ji hêla îdarî ve, Çiyayên Colanê yek ji 13 parêzgehên Sûriyê ye ku paytexta wê Quneytra ye.

### Cih û girîngiya wê:

Cihê istratejîk: Li başûrê rojavayê Sûriyê ye û çavdêriya berfireh a deştên derdorê peyda dike, ev yek jî wê dike xaleke çavdêriya leşkerî ya girîng û xaleke berçav a li ser Şamê û hin beşên bakurê Îsraîlê.
Çavkaniyek avê ya girîng: Şaxên wê Çemê Urdunê û Gola Teberiya, du çavkaniyên avê yên girîng ên herêmê, xwedî dikin û ew bi axa xwe ya berhemdar û çavkaniyên dewlemend ên ava şirîn tê nasîn.
Girîngiya aborî: Ji ber çandinî û




xwedîkirina ajalan wekî "erdê genim û dewaran" tê zanîn û berhemên çandiniyê yên girîng peyda dike. Herwiha ji bo hilberîna petrol û madenan tê bikaranîn.

### Dagirkirina çiyayê Colanê

Îsraîlê di şerê 6 rojan de piraniya Çiyayên Colanê dagir kir û piraniya nifûsa Sûriyê ji cih û warên xwe koçber bûn. Îsraîlê di sala 1981'an de tevlîkirina wê ragihand, lê ev yek ji aliyê Konseya Ewlehiyê ya NY ve hate redkirin û biryara 497'an hat derxist ku tê de tevlîkirin bêbandor ragihand.

### Di nexşeya Sûriyê de Çiyayê Colanê tune ye

Colanê ji wê demê heya niha di bin serweriya Îsraîlê de ye. Di beriya demeke nêz de jî nexşeya Sûriyê ya nû hat weşandin. Wezareta Derve ya Sûriyê ku beşek ji hikumeta nû ya veguhêz e, di postekê de ku ji bo pîrozkirina rakirina cezayên Amerîka nexşeyek Sûriyê weşand. Di vê nexşeyê de Çiyayên Colan û herêma Îskenderûnê nehatine nivîsandin. Bi vê yekê hikumeta veguhêz dide diyarkirin wekî ku ew daxwaza Colanê nake, herwiha ew ji bo desthilatdariya xwe dikare Sûriyê giştî bide ber bazarê. Di heman demê de aliyên hikumeta veguhêz, Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê tewambar dike ku têkiliya wê bi Îsraîlê heye, lê di nîvisandina vê nexşeyê de tê eşkerekirin ku kî xwedî têkiliye bi Îsraîlê re û kî ne xwedî têkiliye.
Di ecama vê yekê de em dikarin bêjin çareserî ji bo Sûriyê ne bi kirîn û firotinê ye, herwiha ne ji bo berjewendiya ye. Lê çareserî di diyaloga navxweyî de ye.

## Pêwîstiya Sûriyê ne şer e, demokrasiye...



**Zekî Bedran**

Piştî bangên pêşeng û rûspîyên Elewiyan li Sûriyê xwepêşandan pêk hatin. Bersiva HTŞ'ê ji bo van xwepêşandanên bêçek û aştiyane, careke din, bikaranîna hêza tûndiyê bû. Wekî ku tê zanîn, Elewî di meha Adarê de rastî komkujiyekê hatin. Elewî bi tevahî bêrêxistin bûn û nizanibûn çi bikin. Bi gelemperî ew di nav tirs, xof û fikaran de mabûn. Lê, HTŞ'ê ne xwediyê hişmendiyekê naskirin an jî tevlîkirina hêmanên cihêreng ên Sûriyê bû. HTŞ'ê rêya tirsandin, bindestkirin û radestgirtina bi darê zorê hilbijart. Çek, zext û qirkirin pirsgirêkên civakî çareser nakin. Dibe ku şêwazekê wan a taktîkî hebe, lê ew gengaziya bidestxistina encamek tendûrist pêşkêş nakin. Ev rêbaz û nêzîkatî ne ku li Tirkiyê, Sûriyê û herêmê bi berfirehî hatine bikar anîn. Sedsalek e, Tirkiye dibêje, "Kurd tune ne, her kes Tirk e." Yên ku xwe wekî Kurd dinasîn, wekî cudaxwaz û xayîn hatin ragihandin. Êş û wêraniyeke bêhempa çêbû. Lê di dawiyê de, ev rêbaza ne dîtin û derewan encama xwestî neda. Rejîma Baas'ê rêyeke cuda neşopand. Zilm û înkar bi tevahî bi kar anî. Rejîma Baasê endezyariya civakî kir, siyaseta kembera Erebî pêk anî da ku hejmara Kurd kêm bike û gelên Sûriyê xeniqand. Wî rejîmeke yekdest ya zalim ava kir. Di dawiyê de, rejîmên Baas li Iraq û Sûriyê hilweşiyan.
Li Sûriyê guhertinek rejîmê çêbû, lê mixabin, di hişmendiyê de guhertinek çênebû. HTŞ, bi hişmendiyê de, ji rejîma Baasê jî paşverûtir e, hat ser desthilatê. Hişmendiya wan pir navendî û otorîter, ku ol li nijadperestiya ereb zêde dike, tê ferzkirin. HTŞ dikaribû hikûmetek veguhêz ava bikira ku Kurd, Elewî, Durzî, Xiristiyan û Erebên ku demokrasiyê dixwazin di nav xwe de bigirta. Sûriyê ji bo ku wê bigihîne hilbijartinan, pêdivî bi hikûmetek lihevkirina netewî hebû. Li Sûriyê bi modelek rêveberiyê ku hemû desthilatdariyê di destên xwe de kom dike û komên din ji derve dihêle, aştî û yekîtî nayê bidestxistin. Bi rastîyê de jî tê dîtin, ev nayê bidestxistin. Durzî jî hatin qirkirin û neçar man ku ji bo parastina xwe ji biçin Îsraîlê û penaber bibin. Gelo bindestî û radestgirtina bi zorê dikare di vê serdemê de bibe şewazekî rêveberiyê? Di demên dawî de, li taxên Kurdan ên li Helebê êrîş hene. Qirkirina Kurdên, ku bi salan li wir bi cih bûne û bûne beşek yekgirtî ya civakê, dê kîjan pirsgirêkên Sûriyê çareser bike? Wekî din, li wir danûstandin pêk hatin, û li ser şêwaza ji bo jiyana hevbeş lihevkirinek, hat kirin û peymanek hat îmzekirin. Lê belê ne pabendbûna bi zagonan jiyana hevbeş heye, ne xwestek û ne jî nêzîkbûnekê wisa tên nîşandan. Bê guman, Tirkiye di vê yekê de roleke neyînî dilîze. Lê ravekirina her tiştî tenê bi rêya Tirkiyê pirsgirêkê çareser nake. tevlîhewîyên komên çekdar ên girêdayî artêşa Tirkiyê hene. Her wiha plan hene ku ew tax ji Kurdan bên paqij kirin. Lê hikûmeta Şamê yan di van bûyeran re hevkar e yan jî bê deng dimîne.
Me berê jî gotibû ku Tirkiye pêşeroja Sûriyê tarî dike. Pirsgirêk ne tenê bi dijminatiya Kurdan û qirkirinê ve sînordar e. Stratejiya dewleta Tirkiyê ew e ku Kurdên li Sûriyê têk bibe, wan bê statu bihêle û wan bixe bin serweriya rejîmeke dijwar. Ger rejîmeke dijwar li Sûriyê were pêşde birin, pêşeroja hemû gelên kul i Sûriyê jiyan dikin dê tarî bibe. Ger hemû gel, bawerî û pêkhate li Sûriyê azad bijîn û rejîmeke demokratîk were damezrandin, ev ê hem ji bo Rojhilata Navîn û hem jî ji bo Tirkiyê destkeftiyek be. Gelên Sûriyê yên welatê wan hatiye wêrankirin û dê bêhna xwe vede û vebijêrkekî wan a jiyana hevpar dê ava bib e. Cûdahî dê êdî nebin sedema veqetandin û pevçûnê, û dê li şûna wê bibin çavkaniya dewlemendiyê, reng bidin jiyanê. Hikûmeta Şamê ya veguhêz, bi Rêveberiya Xweser û QSD'ê re li hev kirin û hevpeymana 10'ê Adarê îmze kirin. Ev xalek tê de heye ku agirbestê li tevahî Sûriyê di pejirîn e. Lê, agirbesta li Sûriyê bi rastî nayê bicîhanîn. Xalên din jî bi temamî nehatine meşandin. Civîn bi rêkûpêk di navbera tîmên danûstandinê yên destnîşankirî de nayên lidarxistin. Yan jî, eger ew bi HTŞ'ê ve girêdayî ba, qet civîn û danûstandin pêş ne diketin. Lê, bi navbeynkariya hêzên Hevpeymana Navdewletî hin danûstandin gengaz bûn.
Di danûstandinên destpêkê de, di entegrasyona QSD'ê de israr dikin. Pêşnîyar hat kirin ku ev mijarekê sereke be. Şanda QSD'ê ev yek pejirand. Li ser tevlîbûna hêzên QSD'ê bi şêweyê dabeşkirina nav artêşa Sûriyê de lihevkirinek hat kirin. Lê, dewleta Tirkiye berdewam dike ku asteng bike û şer ferz dike. HTŞ'ê erê dik e, lê Tirkiye dibêje na. Ew bi israr dikin ku QSD bê hilweşandin û ew dikarin wekî takekes tevlî artêşê bibin. Gumanên yên ewlehiyê dixin hincet , ku pêşeroja Sûriyê tarî bike û bixin xeterê. Tirkiyê bi vekirî piştevaniya xwe ji bona komkûjiyên li ser Elewî û Durzîyan dan xuyakirin. Desthiladariya Tirk, ti bertek an jî rexne di derheqê wê mijarê de, ne ragihandîy e. Ew radigihîne ku ew di her şert û mercî de dê pişgirîyê bi hikûmeta Şamê ya vegûhêz. Ev jî bandorek neyînî li ser nermbûna HTŞ'ê û lêgerîna wê ya ji bo bidestxistina rêyên pêkanîna aştiya navxweyî dike. HTŞ'ê tê neçarkirin ku ji bona qirkirin û komkûjiyê li ser gele Kurd jî bi meşîn e. Elewî jî di dawiya de fêm kirine ku tirs û xof ti sûdê nagihijîne wan. Ew gihîştine wê astê ku xwe rêxistin bikin û bertekên xwe bidin nîşanî kirin. Gelemperiya Sûriyê hişmendiya HTŞ'ê na pejirîn e. Kengê cudaxwaz û demokrasîxwezên Sûriyê lihevkirin wê demê pêşeroja Sûriyê dê diyar bib e. Destwerdana hêzên dagirker û biyanî wê demê, dê bê têk birin.

## Roboskî û sala nû



**Farûk Sakik**

Her sal Kurd bi komkujiya Roboskî salek li pey xwe dihêlin û dikevin saleke nû. Mirovahî bi hêviyên nû, bi jiyanek nu ber bi sala nû ve diçin, lê Kurd jî bi hêviyên ku Roboskiyên nû çênebin, dikevin saleke nû.
Di civaka Kurd de hafiza-bîr ne tenê awayê bibîranîna rabirdûriyê ye, di heman demê de avakirina nasnameya polîtîk e.
Balafirên dewleta Tirk di 28'ê Kanûna sala 2011'an de herêmek gundê Roboskî yê navçeya Qileban a Şirnexê bombebarankirin. Di bombebaranê de 19 jê zarok bi giştî 34 kes hatin qetilkirin.
Wêneyên tabûtên ku bi betaniyan hatine pêçan û cenazeyên ku li ser qantiran tên hilgirtin, di bîra kolektîf a Kurdan de wekî "qeyda hafizeya dîtbarî" ya ku qet jênabe, hatiye kolandin.
Berî ku em bikevin sala nû bi van dîmenan em dîsa derbasî raboriya xwe dibin. Derbasî 28'ê Kanûna 2011'an dibin.
Roboskî bi erdnîgariya xwe têgeha "sînor" îfade dikir. Hem cudabûneke fîzîkî hem jî yekîtiyeke dîrokî temsîl dike. Piştî komkujiyê îfadekirina yekîtiya dîrokî diha zêde derket pêş. Dijminên Kurdan sînor danîbûn navbera civaka Kurdan. Kurdan ew sînor tu carî nedîtin-nasnekirin. Bazirganiya xelkê Roboskî li wê heremê bû. Ji bo ku wan sînor nasnedikirin ewroj li wê derê hatin qetilkirin.
Dewletê ev komkujî wekî "qezaya operasyonî" yan "gumanbariya terorê" pênase kir. Erdogan gavek din pêşve çû û digot, "me 4 qat tazmînat teklîf kiriye." Kesên ev teklîf kirin bêucdan û yên qebûl nekirin biucdan derbasî dîrokê bûn.
Ji bo Kurdan û bi taybet ji bo malbatên Roboskî dem di 28'ê Kanûna 2011'an de rawestiyaye-qefiliye.
Her sal di bîranîna vê rojê-qetlîamê de, vê bîra travmatîk nû dikin û bi bîra her kesî dixin ku hê jî edalet pêk nehatiye. Li ser komkujiyê re 14 sal derbas bûye jî hêjî faîl nehatine girtin û cezakirin.
Salek berê dema ku ev pêvajoya 'aştî û civaka demokratîk' dest pê kir, nedihat gotin ku ser van birînan werin girtin. Berevajiyê vê yekê ji bo dermankirina van birînan herdu aliyan bi hev re biketinan nav hewldanan.
Aliyê dewletê, bîr û hafizaya Kurdan, dixwazê bi wan bide jibîrkirin. Bitenê behsa wendahiyên xwe û xwedî derketina hafizaye xwe dike.
Erdogan çima îroj li pêşiya vê pêngavê dibe asteng? Ji bo ku ew berpirsyarê hemû êş û elemên Kurd û Tirkan ên van 23 salên dawiye. Naxwazê der barê van êşan de lêpirsîn werin destpêkirin. Dixwaze, komkujiyên wek Roboskî bi Kurdan bide jibîrkirin. Dîsa dixwaze ku zahiyat û wendahiyên civaka Tirk yên di dema desthilatariya wî de pêkhatine û ew bûye sedem, veşêre.
Û dizane di vê pengava nû de ev sûc û kiryarên wî ewê werin ser masê. Wê dîrok jê hîsab bipirse. Ji bo ku van yek her wek li wê axê neqewîne, berê xwe dide dijminatiya Kurdên Rojava. Dema ku hîtabî civaka Tirk dike, dixwaze xwedî li hafizaya wan derkeve. Her tim behsa zahiyatên hatine dayin dike. Zahiyatên aliyê Kurdan dide aliyek û dixwaze bi Kurdan jî bide jibîrkirin.
Di serdema aştî û civaka demokratîk de tol-heyf girtin tuneye. Tespêtkirina mexdûriyetên herdun aliyan heye û telefîkirina wan esas tê girtin. Xwedî derketina bîr-hafiza ji bo di paşerojê de tiştên waha neqewimin girîng e. Roboskî jî ji van komkujiyan yek e. Roboskî di bîra Kurdan de ne tenê şînek e, di heman demê de wekî "deynê hiqûqî" li ber çavan e. Bîr, li vir kujer bi bîr tîne û daxwaza edaletê pêkwere.
Heger ev hafize zindî nehatiba girtin, Roboskî wê di rûpelên dîrokê de tenê wekî komkujiyek ji rêzê bihata dîttin.




# Xebata SZK'ê di sala 2025'an de

Saziya Zimanê Kurdî (SZK) îsal xebateke berbiçav di warê zimên de kir, 9 berhem derxistin, hem jî 102 xelekên bernameyên cuda qeyd kirin, herwiha di vê salê de sê hezar û 294 bawername li xwendekarên astên perwerdeya zimanê Kurdî yên SZK'ê bi sê astên xwe ve hatine belavkirin

**Hemza Sêvo**

### 9 berhem ji Komîteya Ziman û Folklorê ya SZK'ê

Kovara Hawarê ji nav weşanên Saziya Zimanê Kurdî (SZK) derket. 57 hejmarên Hawara Mîr Celadet Bedirxanî, di du cildan da, ji nav weşanên SZK'ê derketin. Ji bo ku xweştir û hêsantir bê xwendin, Hawar li ber deqa orjînal hatiye venivîsîn û naveroka wê ji nû ve hatiye dîzaynkirin. Pirtûka “Çend Babet û Vekolînên Zimanî” ji nav weşanên SZK'ê derket. Ev berhem ku cara pêşîn bi tîpên erebî, binzaravayê behdînî, hatiye weşandin, ji heft babetên zimanî yên cihêreng pêk tê. Herwiha pirtûka “Dibistanên Modern ên Hizira Zimanî” ji nav weşanên SZK'ê derket. Ev berhem bi awayekê kronolojî; li gor rêza demê, wan dibistanên zimanî dide nasîn û cudahiyên di navbera wan da diyar dike. Di heman demê de mijarên girêdayî zimannasiyê yên mîna paradîgmên teorî, modelên rêzimanî, bikaranînên pratîkî û metodên teknîkî nîqaş dike. Piştre Cildê çarem ê "Avestayê" ji nav weşanên SZK'ê hat derxistin. Berhema "Avesta 4 – Destnivîsên Orîjîn: Yašt" ya avestolog Beyhanî Şahînî ye. Ev berhem destnivîsên Avestayê yên bi navê "Yašt"ê dihewîne û ji 758 rûpelan pêk tê. Piştre 'Seta Wergerê' ya zimannas Deham Ebdulfettah, ji nav weşanên Saziya Zimanê Kurdî (SZK) derket. Ev set ji 3 berhemên wergerandî pêk tê. Hem jî DASTANA GILGAMÊŞ hat derxistin. Ew ji 12 depan pêk tê. Ji zimanê erebî, li ber berhema Fîras El-Sewahî hatiye wergerandin û bi gelek jêderên




cîhanî ra hatiye hevrûkirin. (çapa 4'an) ÇARÎNEYÊN XEYYAM jî berhemeke ku di vê salê de hat derxistin. Ew ji 130 çarîneyan pêk tê. Ji zimanê erebî, li ber berhemên Ehmed Safî Elnecefî û Mistefa Wehbî Eltel hatiye wergerandin û bi deqa orjînal (zimanê Farisî) ra hatiye hevrûkirin û li berê hatiye sererastkirin. Bi çapa 2'yan hat derxistin. YARSAN YAN JÎ EHLÎ HEQ ji 5 gotaran pêk tê. Gotarek ji zimanê erebî û çar gotarên din bi alîkariya Islah Ebdulfettahî ji zimanên fransizî û îngilîzî hatine wergerandin. Bi çapa 2'yan hat derxistin. Berhema Gangulokên zivistanê ya çîrokên gelêrî ji nav weşanên SZK'ê derket, ev berhem

### Amadekirin û wergera berheman tê domandin

Ferhenga Termên Rêveberî: Ev ferheng termên girêdayî biwarên rêveberî li gel şîroveyên wan dihewîne, ji bo çapê tê amadekirin. Destpêkek ji bo Dengsazî û Dengnasiyê: Ev berhem li ser mijar û babetên dengsazî û dengnasiyê ne tê amadekirin. Di heman demê de 13 berhemên têkildarî ziman û zimannasiyê tên wergerandin.

### Komxebat

Komxebata yekem a zimanî hat lidarxistin û bi çar civînan temam bû. Komxebatê 12' Nîsana 2025'an dest pê kir, di civînê de hem rêveber û şêwirmendên Meclisa Perwerdeyê (Saziya Zimanê Kurdî, Meclisa Zanîngehên Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, Desteya Perwerdeyê ya Herêmê, Peymangeh û Akademiyên Desteya Perwerdeyê yên Kantonan, Yekîtiya Mamostayan, Akademiya Lêkolînên Stratejîk û Saziya Minhacan) hem jî endamên beşa zimanî yên heman dezgehên navborî ku dê di komîteyê de nûneriya dezgehên xwe bikin, amade bûn. Komxebat ji bo yekkirina mijarên rastnivîsînê lidarxistin. Gelek qanûnên meclis û saziyên Rêveberiya Xweser a Demokratîk a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatin wergerandin.

### SZK medya:

Her Carê Peyvek, bernameyeka ferhengî ya peyvên kêmnas e. Her carê, peyveke kêmnas li gel nimûneyan û pêvajoyên bikaranînê dihat şirovekirin. Bi dirêjahiya vê salê 60 xelek hatin weşandin.
Pirseka Kurdî, bernameyeka pirsan a li kolanê ye. Naveroka pirsan bêhtir ferhengî ye, pirs bi tevahî girêdayî zimanê Kurdî ne. Bi dirêjahiya sala 2025'sn 30 xelek hatine weşandin.
Hêlîna Zarokan, sê zarokan pêşkêş kiriye, bernameyeke perwerdeyê ya zarokan e ku bi şêwazê montessorî tê amadekirin. Bername herî pêşîn ji bo hînkirina zimanî ye û wekî din hînkirina hest û derbirînên cuda, sinc û exlaqên sereke, tevgera û reftarên ewle û durist ji bo zarokan e. Di vê bernameyê de jî 12 xelek hatin qeydkirin.

### Komîteya perwerdeyê:

Li tevahî kantonên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê perwerdeya zimanê Kurdî ya her sê astên destpêkê berdewam e. Li navendên SZK'ê yên kantonan hem mamostayên zimanê Kurdî tên amadekirin, hem jî kesên ku bixwazin hînî xwendin û nivîsîna zimanê Kurdî bibin tên perwerdekirin.

### Hejmara girûpên ku di vê salê de perwerdeya wan bi dawî bû:


-Asta fêrbûnê: 16 girûp bûn di nav de 322 xwendekar hebûn.
-Asta yekem: 177 girûp hezar û 975 xwendekar hebûn.
-Asta duyem: 105 girûp 982 xwendekar vehewandin.
-Asta sêyem: 68 girûp, di nav de 510 xwendekar hebûn.
-Herweha di vê salê da sê hezar û 294 bawername li xwendekaran hatine belavkirin.

# 'Armanca Koma Şehîd Delîla xwedîderketina li çand û hunerê ye'

**Aylîn Ehmed/ Amûdê**

**Rêveberiya çand û hunera Hûrî ya Hîlala Zêrîn a bajarê Amûdê Bêrîvan Elî diyar kir ku Koma Şehîd Delîla ji sala 2022'an ve hatiye avakirin û wiha got: "Armanca Koma Şehîd Delîla xwedîderketina li çand û hunerê ye."**

Di navenda Çand û Huner a bajarê Amûdê de, gelek kom cihê xwe digirin, yek ji wan koman jî Koma Şehîd Delîla ye. Koma şehîd Delîla ji sala 2022'an de hat avakirin. Hejmara endamên vê komê di nav zêdebûnekê de ye, lê hejmara endamên bicihbûyî ji 12' kesan pêk tê. Koma şehîd Delîla di warê hunerê de gelekî li pêşe.
Koma şehîd Delîla bi awaz û hestên xwe yên xweş, bi amûr û stiranên xwe pêşkêşî cîhanê dikin. Ev kom wek hemî koman her dem bi dengê xwe cihê xwe di her fistîvalekê de digire



û herwiha bi wan awazên xwe yên xweş hestên mirovan kêfxweş dike. Di derbarê kar û xebatên xwe de rêveberiya çand û hunera Hûrî ya Hîlala Zêrîn a bajarê Amûdê Bêrîvan Elî ji rojnameya me re axivî.

### 'Koma Şehîd Delîla di sala 2022'an ve hatiye avakirin'

Rêveberiya çand û hunera Hûrî ya Hîlala Zêrîn a bajarê Amûdê Bêrîvan Elî diyar kir ku ew kom di sala 2022' an de hatiye avakirin û wiha got: "Koma Şehîd Delîla ji zû ve hatiye avakirin, lê di despêkê de ev kom belavbûyî bû û tû kesî zêde cihê xwe tê de nedigirt. Koma Delîla beriya 3' salan heya ku demek di ser re derbas bû ji nû ve ev kom hat vejînkirin û her kesî tê de cihê xwe girt. Ji xwe niha hejmara endaman di nav zêdebûnekê de ye, lê hejmara endamên bicihbûyî ji 12' kesan pêk tê û endamên Koma Şehîd Delîla ciwanên pir hêjan e û her ciwanek li ser amûrekê li ritmekê dixin. Ciwanên Koma Şehîd Delîla di riya wan saz û ritman re her tim dixwazin dengên xwe bigihînin civakê ku ew ciwan in û armancên wan jî hene. Koma
Şehîd Delîla komek di warê hunerî de zû xwe bi pêş xist û dixwazin her nameyekê bigihînin derdorê û wek ciwanan di riya pêşketinê xwe de dengên xwe belav bikin û hêza xwe bidin xuyanîkirin."

### 'Koma Şehîd Delîla di warê hunerî de gelekî li pêş e'

Bêrîvan Elî anî ziman ku Koma Şehîd Delîla tevlî gelek çalakiyan bû û wiha bi dawî kir: "Hate gotin ku Koma Şehîd Delîla di warê hunerî de gelekî li pêş e û di heman demê de jî zû bi zû xwe ava kir û bi ser ket, ji ber vê yekê vexwendin ji gelek aliyan hat xwestin ku ev kom tevlî festîvalan bibe û li her şahiyan ev kom derkeve. Ji xwe niha bernameyên me ji bo dema pêş heye, em amadekariyên xwe ji bo Festîvala Orkêş dikin, hem jî li ser klîbên nû dixebitin û di heman demê de jî sitran tên amadekirin. Nameya Şehîd Delîla ji hemî ciwanê re ew e ku şerim nekin û li çand û hunera xwe û berhemên xwe xwedî derkevin, hem jî bila ciwan xwe li pêş bixin da ku bigihin asteke bilind."

## Têbînî

## "ji Eremeniyan Sergîs nas dikin"



**Kemal Necim**

Birayên me rewşenbîrên parçeyên din ên Kurdistanê çaxê ku li ba wan mihircaneke çandî yan wêjeyî tê lidarxistin û dixwazin hin mêvanan ji Rojava jî vexwînin, heme çend kesên ku berî 40 salî navên wan bihîstine vedixwînin, weke ku ji 40 salan û vir de li vî welatî nifşekî din ê rewşenbîran û nivîskaran çênebûye û mezin nebûye.
Ev mijara çawa çêbûye? Di demekê de li Sûriyeyê û Rojava ji ber ku ziman û weşana Kurdî qedexe bû, kêm kesan xwendin û nivîsîna bi zimanê kurdî dizanîn. Di wê demê de hin xwendevanên ku destpêkê bi zimanê Erebî dinivîsin, ji xwe re hin çavkanî peyda kirin û xwe fêrî nivîsîn û xwendina bi zimanê Kurdî kirin.
Her çiqas ew rewşenbîr têra xwe di rastnivîs û rêziman û ferhenga Kurdî de kûr nebûn jî, lê di wextê xwe de pêşengên nivîsîna bi Kurdî bûn û li gorî karîna xwe xizmetk kirin. ji ber ew kes li ser tiliyan dihatin hijmartin, navên wan tenê belav bû û hat naskirin, eger carna çalakiyeke çandî li deverke din a Kurdistanê dihat lidarxistin ew çend nav vedixwendin wan çalakiyan.
Ji salên 2000 û vir de û bi taybet di 15 salên dawîn de piştî şoreşa li Rojava, rewşa zanist û raman û çand û wêje û dîroka Kurdî pir hat guhertin. Êdî derfert û çavkanî pir bûn, peymangeh û zanîngeh vebûn, ramyariya kurdî kete ser rêya hostayiyeke berferh û gelek pirsporên akademisyen di hemû warên çanda Kurdî de pir bûn û bi awayekî akademîk êdî bi ramanê re mijûl bûn.
Di vê navbrê de ew kesên ku me behsa wan kir her çiqas di dema xwe de pêşeng bûn, lê di dema niha de mixabin man li paş, her di çarçoveya ew zanebûna ku berî 40 salan wergirtibûn de man.
Bi van pêşketinan re êdî mijarên konferans û mihricanan jî berferhtir bûn û kûrtir bûn ku ewcedarî bi kesên bîrwer, hosta û akademisyen heye.
Lê tevî wilo jî, di vê sala bûrî de li başûrê kurdistanê çend çalakiyên rewşenbîrî û ramyarî yên girîng hatin lidarxistin, vêce li şûna ku rêveberên van çalakiyan berê xwe bidin pisopr, akademisyenên Rojava û wan bikin mêvanên çalakiyên xwe, dîse her berê xwe dan wan çend navên ku nas dikin, weke çawa meteloka kurdî dibêjê "Filankes ji Eremeniyan Sergîs nas dike". Ew kes jî bi rastî ne xwediyê wê şiyana ramyarî û zanistî ne ku mijarên kurdolociyê yên berferh û kûr binirxînin yan ramanek û zanebûneke hemdem û nûjen bidin wan panel û semîneran.
Dibe ku mijar hinekî bi alîgiriya siyasî ve girêdayî be, dibe ku karbidestên wan çalakiyan xwe nawestînin û lêgerînekê çênakin, yan jî dibe ku hayê wan ji qada rewşenbîrî ya Kurdî li Rojava tune ye.
Pir girîng e ku karbidetên çalakiyên çandî û rewşenbîrî li parçeyên din ên kurdistanê der barê rewşa çandê li Rojava agahdar bin û zanibin ka çiqas helbestvan, çîroknivîs û romanivîs û lêkolîner û pisporên dîrok û hunerê û erkolociyê li vî welatî serwext bûne û dikarin sûdeke mezin bidin ramangêriya Kurdî li parçeyên din ên Kurdistanê. Eger wilo nebe wê her tim Sergîs bibe mêvanê wan û heman çîrokên xwe yên berî 40 salan dubare bike.

# Parastina jîngehê parastina jiyanê ye

Parastina jîngehê yek ji mijara herî girîng e ku mirov li ser bisekine, ji ber ekolojî bi tendirustî û derûniya mirovan ve girêdayî ye. Pêwîst e civak bi taybetî sazî û dezgehên girêdayî civakê parastina çanda jîngehê bikin, da ku bi hev re herêmeke paqij û saxlem ava bikin.

**Dîlan Mulhim\Qamişlo**

Paqijî çand û şêwazeke jiyanê ye ku em bi rêya komek kevneşopiyên saxlem ên ku em rojane pêktînin digirin, da ku tenduristiya xwe wekî takekesan û ewlehiya jîngeha li derdora misoger bikin.

### Girîngiya paqijiyê

Paqijî yek ji wan hêmanên herî girîng û bingeha jiyanê ye ku ji bo mirovan pir pêwîst e. Ew tê wateya parastina tenduristiya laş, giyan û jîngehê ji ax, mîkrob û nexweşiyan. Paqijî kesayetî, tevger û cihê mirov di civakê de nîşan dide. Her kes rêzê ji mirovê paqij re nîşan dide, cihê bawerî û rûmetê ye. Xwe rihet, bextewar û ji xwe bawer hîs dike.

### Parastina paqijiya jîngehê

Jîngeh tişta herî girîng di jiyanê de ye û ji bo ku jîngeh paqij û bedew bimîne, pêwîst e mirov gelek gavên berbiçav, girîng û birêkûpêk bavêje da ku jîngeha xwe saxlem û paqij bihêle.

### Divê civak bi çanda paqijiyê bigihîje asteke pêşketî

Divê her kes paqijiya kolan, tax, gund û bajarê xwe bike. Ji ber ku civak bigihêje asteke pêşketî û bi çanda paqijyê re jiyan bike. Herwiha karê herî girîng û pîroz karê paqijiyê ye. Paqijî gelek girîng e, rê li pêşiya belavbûna nexweşiyan digre û dihêle ku şaristaniya bajêr were parastin. Weke tê zanîn ku çanda paqijê di nava civakê de kêm e, welatî çopê davêjin kolan û parastina jîngehê nakin. Lewma welatî gazinan ji şaredariyê dikin û dibêjin ku bi erkê xwe ranabe. Di heman demê de, îro ne şaredarî tenê bi erkê xwe ranabe, ji ber ku di heman demê de xizmet û paqjiya kolan, tax, gund û bajêr erka her kesî ye. Lewma belavkirina çanda paqijiyê di nav gel de, bedewiya welat e. Di heman demê de, ajokar gemara xwe bêyî ku girîngiyê bidin malan an jî şêniyan davêjin kolanan û kesên ku avahiyan lêdikin kolanan qirêj dihêlin. Ji bo ku welatê me paqij bibe, Pêwîst e her kes li hemberî paqijya welatê xwe berpirsyar be.

Parastina paqijiya jîngeh û derdora me ji çend aliyan ve pêk tê. Ji perspektîfa mirovan e ku divê her ferdê vê civakê hewl bide ku jîngehek paqij û bê qirêjî ava bike. Hevkarî û dilsoziya kesan bi jîngeha xwe re, hewaya paqij, axa çandiniyê û ava vexwarinê tê bidestxistin. Divê her kes xwe ji bîr nekin û kesên derdora xwe bi qirêjiya bajêr û jîngehê sûcdar nekin, bi hev re, em dikarin jîngeha xwe biparêzin û bi erkên xwe yên li hember wê rabin û nepirsin ka kî berpirsiyar e. Eger her kes dora mala xwe paqij bike, wê her dever paqij bimîne. Paqijî xweşik e, lê çiqas mezin e gava ew di hişê me de be. Jiyana



te bi qîmet e, wê qirêj neke û nexe xetereyê.

### Parastina jîngehê di rastiya xwe erkekî girîng û sereke ye

Jîngeha ya herî girîng di vê jiyanê de ye, û ji bo ku ev jîngeh paqij û bedew bimîn e, pêwîst e ku her kes civaka parastina jîngehê bike. Herwiha yek ji xalên herî girîng ên paradîgmaya Rêber Apo û Şoreşa 19'ê Tîrmehê kar û xebatên parastina jîngehê bû. Ji ber ku beriya şoreşa 19'ê Tîrmehê ji milê sîstema serdest ve tu guhdan ji bo xweza û jîngehê nedihatin kirin. Herwiha hemû sererd û binerdên xakê dihatin talankirin. Lê bi hatina Rêber Apo û Şoreşa Rojava, desteyek bi navê Jîngehê ya ku ji aliyê Rêveberiya Xweser ve hat avakirin bi erkê paqijiya derdorê û jîngehê radibe. Bi qasî ku mirov ji bo xwe nasname û çand diparêze û girîng dibînin. Divê ekolojiyê jî ji bo xwe wek nasname bibînin, ji ber ku ekolojî bingeha civakê ye. Gelek zindî li ser rûyê erdê hene û rojane jî jiyan dikin. Ekolojî girîngtirîn tiştên ku me ji ziraran diparêze û bandorê li hebûna zindewerên li ser rûyê erdê dike. Bandorek pir mezin li jiyanê dike. Ji ber vê yekê parastina jîngehê di rastiya xwe erkekî girîng û sereke ye. Em dikarin bibêjin ku di destpêka mirovahiyê de li kokên vê pirsgirêkê bigerin. Bi zêdebûna desthiladariyên di nav civakê de mirov ji hevdû dûrketin û di heman demê de mirov ji xwezayê jî dûr bûn. Mirov dikare bîne ser ziman ku civak di cewherê xwe de rastiyeke ekolojîk e. Mebest ji ekolojiyê ew e ku bi ruhekî pak, civakê zindî bike. Ders û encama em dikarin ji vê bigirin, ew e ku mirov nikare di bin desthiladariyê de bijî. Ji ber wê jî pêwîst e her kes ekolojiyê biparêzin û cihekî ekolojîk taybet di jiyana xwe de ava bikin.

### Civak û ekolojî wek goşt û neynûk in

Civak û ekolojî wek goşt û neynûk in, tu car nikarin ji hev dûr bikevin, ji ber ku ekolojî û civak hev temam dikin. Bi vê armancê jî eger em daxwaza civakek pak û xweşî bikin mijara destpêkê em li ser bisekinin dibe ku ekolojî be. Dikare bê gotin ji despêka ku mirovên sereke hîmên xwe avêtiye li ser vê axê heya roja me ya îro rolek girîngî daye her tiştên hewîrdora xwe. Yanî xweza bi awayek zindî dîtiye û pênase kiriye. Di heman demê de, hemû bûyerên ku di xwezayê de rû didin, di hêla mirov de pêhesîn dide avakirin. Ev jî tê wateya ku mirov çiqasî bi ekolojiyê bandor dibe. Herwiha di sîstema me de ekolojiya herêmê bi qasî demokrasiyê girîng e. Ji ber ku ekolojî lingekî bingehî yê Neteweya Demokratîk e. Mirov bê xwzayê nikare bi tu awayî bijî. Xweza her tişta jiyanê di nava xwe de dihewîne. Ji bo wê jî pir girîng e ku em vê xwezayê biparêzin. Parastin jîngeh bikin, lewra parastina jîngehê parastina jiyanê ye.

### Paqijî jî girêdayî hişmendiya mirovan e

Paqijî jî girêdayî hişmendiya mirovan e, pêwîstî bi guhertina hişmendiyê heye. Dema her kes xwe berpirsyar bibîne mal û taxa xwe paqij bike dê bajar paqij bimîne. Paqijî exlaq û çanda civakê ye. Çawa ku welatî parastina paqijiya malên xwe dikin, divê di heman demê de parastina kolanên bajarê xwe jî bikin. Lewra çareseriya paqijiyê di hevkariya gel de ye. Şaredarî çiqas paqijiyê bike jî, eger gel ne alîkar be û çanda paqijiyê di nava civakê de nebe, paqij nabe û wê diyardeya avêtina çopê dewam bike.

Gelên paqij ew gelên ku rêzdarî ji xwe û gelê xwe re digrin, dixwaze wêneyek xweşik ji yên din re nîşan bide, ji ber ku paqijî cûreyek ji exlaqê ye. Di heman demê de, parastina paqijiya bejahiyê erkeke divê her kes beşdar bibe, ji ber ku gelek mirov tê de jiyan dikin, herwiha paqijî mîna neynikekê pêşketina welat nîşan dide. Her çiqas ku gel parastina paqijiya bajarê xwe bike, wê ew bajar an welat pêş bikeve.

### Pêwîst e mirov derdora xwe paqij bike

Pêwîst e mirov welatê xwe qirêj neke, herwiha divê her kes derdora mala xwe û taxa xwe biparêze û paqij bike, çopê navêje nava kolanan û bixe cihên taybet yên ji bona çopê hatine bi cih kirin û bi şaredariyê re di vî warî de alîkariyê bike û hevdû temam bikin û bi dilsozî kar û xebata xwe pêkbînin. Da ku her tim welatê me xweşik û paqij be.





# Mitînga Hêvî û Azadî; Herikîna bi sed hezaran ji bo azadiya Rêber Apo ye

Alîkarê Hevserokê Giştî yê DBP'ê Hûseyin Birlik diyar kir ku dewleta Tirk û rayedarên wê dixwazin bê azadiya Rêber Apo vê pêvajoyê bimeşînin, gel û rêveberê vî gelî ji hev cuda bikin, lewma wê Platforma Saziyên Demokratîk di 4'ê Çileyê de li Amedê bi dirûşmeya "Azadiya birêz Ocalan azadiya min e" mîtînga "Hevî û Azadî" li dar bixin.

**Ronahî Sadûn**

Ji hêla Platforma Saziyên Demokratîk ve dê di 4'ê Çileyê de mîtînga "Hêvî û Azadî" li qada Îstasyonê ya Amedê bê lidarxistin ku tê de daxwaza azadiya fizîkî ya Rêber Apo bê kirin. Ji ber Azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan wê jî Kurdistanê re statu û ji Rojhilata Navîn re aramî, aşitî û azadîyê bîne. Li ser vê bingehê amadekariyên xurt ji bo mîtîngê ji aliyê platformê ve têne kirin. Derbarê mîtînga "Hêvî û Azadî" ya ku di 4'ê Çileyê de li Bakurê Kurdistanê bê lidarxistin, alîkarê Hevserokê Giştî yê DBP'ê Hûseyin Birlik ji Rojnameya me re axivî.




### 'Desthilatdarên Tirkiyê ji derveyî naskirina hebûna Kurd tu şans jêra nema ye'

Hûseyin Birlik diyar kir ku ji derveyî qebûlkirina gelê Kurd tu şansê komara Tirkiyê û hikumeta li ser desthilatdariyê nema ye û wiha got: "Bingehê avakirina komara Tirkiyê çi rayedar çi hikumeta hatiye ser desthilatdariyê, heya îro xwestine bi plansazî û polîtîkayên xwe yên li ser înkar, îmha û asîmîlasyona gelê Kurd û gelê din ên ji derveyî nasnama Tirk, komarekî yek reng, yek zinan û yek netew ava bikin. Bi van nêzîkatiyên xwe ji derveyî gelê Kurd, li ser gelên din ên cuda cuda pişaftinekî heya astekî serkeftî, ev armancên xwe pêk anîn. Lê belê bi berxwedan û têkoşîna gelê Kurd, bi taybetî bi pêşengiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û tevgera ku dayê avakirin, ev polîtîkayên wan yê tune hesibandinê, nekarîn pêk bînin. Tevî hemû derfetên xwe xistin meriyetê, lê dîsa jî armanca ku di xwestin nekarîn bi ser bixin û çongê Kurdan deyînin. Bi vê berxwedanê Kurd hem li Rojhilata Navîn, hem jî li tevahî cîhanê xurt bûn û rêxistina xwe mezintir kirin. Di encamê de komara Tirkiyê û hikumeta li ser desthilatdariyê, ji derveyî naskirina hebûna Kurd, derfet jêre nema. Lewma bi mimarê vê berxwedanê Rêber Apo re hevdîtin pêk anîn û 27'ê Sibatê bi bangawaziya "Aşitî û Civaka Demokratîk" bi pêvajoyek nû derbasî vê qonaxê bû."

### 'Bê azadiya Rêber Apo azadiya gelê Kurd jî nabe'

Birlik anî ziman ku dewleta Tirk dixwaze pêvajoyê bê azadiya Rêber Apo bimeşîne û wiha pê de çû: "Hebûna gelê Kurd êdî bi êşkere tê naskirin, ji bo wê pêwîst e azadiya gelê Kurd awayekî hiqûqî were mîsoger kirin. Niha dewleta Tirk û rayedarên wê dixwazin bê azadiya Rêber Apo vê pêvajoyê bimeşînin, gel û rêberê vî gelî ji hev cuda bikin. Em jî wek Platforma Saziyên Demokratîk di 4'ê Çileyê de li qada Îstasyonê ya Amedê bi dirûşmeya "Azadiya birêz Ocalan azadiya mine" mîtînga "Hevî û Azadî" li dar bixin. Da ku em ji her kesî/ê re eşkere bikin ku bê azadiya Rêber Apo azadiya gelê Kurd jî nabe. Armanca me ew e ku ji bo pêşketina pêvajoya "Aştî û Civaka Demokratîk", herwiha rastkirina şertên muzakerê û azadiya Rêber Apo, em bi herikandina sed hezaran gelê xwe li qada îstasyonê helwest daynin."

### 'Ji bo mîtînga Hêvî û Azadî xebat berdewam e'

Birlik eşkere kir ku bi awayekî xurt amadekariyên mîtînga "Hêvî û Azadî" tê kirin û wiha bi lêv kir: "Mîtînga li Amedê bê lidarxistin, esasê xwe mîtîngek herêmî ye ku ji tevahiya Bakurê Kurdistanê û ji beşên Tirkiyê wê tevlîbûn çê bibe. Ji bo wê jî ev 3 roj in li hemû deveran kar û xwebat berdewam dikin ku heya niha bi sed hezaran belavok û bi sedan pankartên li kuça tên vekirin, hatine amade kirin. Herwiha xebatên gund, navçe û bajaran bi komîsyonên hatine avakirin re, bi hemû xebatkar û hilbijartiyên xwe ve serdanên malbatan tên kirin. Ji ber ku azadiya Rêbe Apo wê ne tenê ji bo gelê Kurd, lê wê ji bo hemû gelan aramiyê bîne. Lewra hevkarî û xebatên bi sazî û dezgehên ku çareseriyê dixwazin re, hevdîtin û vexwendina wan tê pêkanîn. Di heman demê de her roj û êvaran bi gel re bername û civîn têne lidarxistin. Bi motivasyonek pir xurt amadekariya mîtîngê berdewam dike."

### 'Pêwîst e her kes xwe wekî çêkerek vê pêvajoyê bibîne'


Birlik tekez kir ku ew bawerin wê qada mîtîngê bi çoşeke mezin be û wiha anî ziman: "Em bawerin wê ji hemû bajarên Bakurê Kurdistanê bi sed hezaran qada mîtîngê tijî bikin, ji ber ku ev mîtîng wê bi armanca azadiya Rêber Apo bê lidarxistin. Li ser vê bingehê jî li hemû bajar, rêxistin û saziyên me amadekarî tê kirin. Cûdahiya vê mîtîngê ji mîtîngê din ew e ku rêhevalên Rêber Abdullah Ocalan ên li girtîgeha Îmraliyê li gel wî mane, birêz Veysî Aktaş û birêz Çetîn Arkaş wê wek axaftvan tevlî mîtîngê bibin. Her wekî din Parlementera berê Leyla Zana, hevserokê partiyê DEM'ê birêz Tûncer Bakirhan, hevseroka DBP'ê Çigdem Kiliçgûn Uçar û li ser navê TJA'yê Ayla Akat Ata wê tevlî bibin. Pêdivî pê heye ku gelê me ji 7 salî heya 70 salî wekî erkekî sereke li ser xwe bibîne ku hem beşdarbûna vê mîtîngê, hem di xwedîderketina vê pêvajoyê de xwe bi rêxistin bike û têkoşîna xwe mezintir bike. Yanî ne li bendê mayî tiştekî be, lê wekî çêkerek vê pêvajoyê xwe bibîne, da ku di demek zû de çareserî pêş bikeve."

### 'Ji bo xwedîderketina li siberojê, divê ciwan pêşeroja xwe ava bike'

Birlik da diyarkirin ku dînamîzma vê pêvajoyê jin û ciwan in û wiha got: "Eger guhertinekî çêbe wê bi pêşengiya jinên ku xwedî felsefeya "Jin, Jiyan, Azadî" ne ku li tevahiya cîhanê deng danê, wê çêbe. Bi tevlîbûn û keda ciwanan di xebatên têne kirin de, moral û motîvasyonekî pir xurt heye. Herwiha ji bo xwedîderketina li siberojê, divê her ciwan îro pêşeroja xwe ava bike. Li ser vê bingehê banga me ji bo hemû ciwanan ew e ku bi herikandina qada mîtîngê hem bi dengê xwe û hem bi drûşmeyên xwe, helwesta xwe nîşan bidin."

### 'Gelê Kurd hebûna azadiyê ye'

Hûseyin Birlik axaftina xwe wiha qedand: "Bi berxwedanê, gelê Kurd hebûna xwe da qabûl kirin. Êdî dem dema azadiyê ye. Ji bo em jiyaneke azad ava bikin, pêwîst e em li nirx û berdêlên xwe ên giran buha, xwedî derkevin. Azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan wê jî Kurdistanê re statu û ji Rojhilata Navîn re aramî, aşitî û azadîyê bîne. 4'ê Çileyê roja yekşemê seet 12:00'an li qada îstasyone mitîng bê lidarxistin."



## Lîstika Entegrasyonê û Geşbûna DAIŞ'ê

**Erdogan Altan**

Kaosa ku li qada Sûriyeyê tê jiyîn, dihêle ku bingeh ji komên çete yên radîkal nefes bigire re amade dike. Di vê çarçoveyê de, DAIŞ bi hatina HTŞ'ê ya li ser desthiladariya Şamêli herêmê derfetên nû ji bo xwe diafirîne. Tevî dijminatiya wan, têkiliyên ku bi taybetmendiyên wekhev û têkiliyên mirovî yên ku ji ber şer hatine afirandin, dihêlin ku DAIŞ'ê ji nû ve xwe birêxistin bike. Ji aliyekî din ve, hatiye destnîşankirin ku komên çete yên girêdayî dewleta Tirkiyeyê di astên cûda de bi DAIŞ'ê re têkilî danîne.

Zêdebûna Çalakiyên DAIŞ'ê li Helebê;

Êrîşên li derdora Helebê di mehên dawî de nîşan didin ku DAIŞ dîsa xuya bûye.

- Di 4'ê Mijdarê de, li ser rêya Heleb-Deyr ez-Hefîl êrîşek li ser wesayîteke gumrikê hat kirin, du efser hatin kuştin.
- Di 26'ê Mijdarê de, li ser rêya Heleb-Reqayê dewriyeyek hat hedefgirtin, çend efser birîndar bûn.
- Di 20'ê Kanûnê de, li nêzîkî Til Rifatê barîkatek demkî hat danîn.
- Di 23'ê Kanûnê de, hêzên ewlehiya navxweyî şaneyek DAIŞ'ê ji hev xistin, sê çekdar û cebilxane desteser kirin.
- Di heman rojê de, li taxa Şehrê li ser dîwarê dibistanekê sloganên DAIŞ'ê hatin nivîsandin.
- Di 27'ê Kanûnê de, endamekî Wezareta Parastinê hat kuştin.

Ev hejmar bi zelalî nîşan didin ku ji dema ku herêm ketiye bin kontrola komên ku ji aliyê Tirkiyeyê ve têne piştgirî kirin, çalakiyên DAIŞ'ê zêde bûne. Wisa xuya dike ku her du alî jî bi heman perspektîfê tevdigerin û dixwazin aloziyê her tim bilind bihêlin.

Cihên Çeteyên ku ji hêla Tirkiyeyê ve têne piştgirîkirin di Artêşa Sûriyeyê de;

- Firka 72 (Doxan/Sultan Muhammed Fatih), Firka 76 (Seyf El-Dîn Polat/Ebû Bakir) li Helebê.
- Firka 62 (Muhammed Casim/Ebû Emşa) li Hemayê.
- Firka 68 (Ehmed Hesun/Ebû Hatim Şekra) li Dêra Zorê.

Tevgera DAIŞ'ê ya Bilindbûyî li Hums, Hama û Dêra Zorê;

- Di 8'ê Cotmehê de; Êrîşa dewriyeyê li ser rêya Tedmur-Humsê.
- Di 16'e cotmehê de; Êrîşa li ser hedefa leşkerî li gundewarê Dêra Zorê.
- Di 17'ê Cotmehê de; Êrîşên li dora gundê Şaumeriye.
- Di 20ê Cotmehê de; Kemîn li rojhilatê Reqayê.
- Wesayîta leşkerî li Çola Sihna di 14'ê Mijdarê de hate hedefgirtin.
- Mayîna li ser wesayîta ku karkerên petrolê hildigirt di 16'ê Mijdarê de hate çandin.
- Di 26ê Mijdarê de.Êrîşa dewriyeyê li rojhilatê Dêra Zorê.
- Çalakiya li Çola Humsê di 29'ê Mijdarê de zêde bû.
- Êrîşa dewriyeyê li rojhilatê Hamayê di 6'ê Kanûnê de, du kes hatin kuştin.
- Grafitiyên li ser dîwaran li Hums û Hamayê di 12-13'ê Kanûnê de hatine nivîsandin.
- Di 13'ê Kanûnê de Êrîşa li ser şandeya Koalisyonê li Tedmûrê, du leşkerên Amerîkî û wergêrvanek hatin kuştin.
- Grafîtî li Derayê di 17'ê Kanûnê de.
- Di 26'ê Kanûnê de, mizgefteke Şîe li Humsê hate teqandin.

Wekî ku di rêzeçalakiyên ku ji aliyê DAIŞ'ê ve hatine kirin de tê dîtin, asta çalakiyên rêxistinê di demên dawî de pir zêde bûye. Tiştê balkêş ev e ku ev hemû çalakî li deverên ku ji aliyê komên girêdayî dewleta Tirkiyeyê ve têne kontrolkirin pêk tên û DAIŞ'ê heta niha çalakiyek li dijî wan nekiriye. Ev yek nîşan dide ku têkiliyek stratejîk di navbera wan de heye.

Nêzîkatiya dewleta Tirk a li hember Sûriyeyê stratejiyeke dagirkeriyê ye ku tenê berjewendiyên xwe dide pêş. DAIŞ û çeteyên girêdayî wê taşeronên van berjewendiyan in.

Ev sîstema qirêj ku li ser xwîna gel hatiye avakirin, armanc dike ku Sûriyeyê bi rijandina xwînê ya gelên Ereb û Kurd li dijî hev qels bike.

Tekane armanca van polîtîkayan ew e ku herêmê di nav pevçûnên domdar de bihêle û berjewendiyên Tirkiyeyê mîsoger bike.

# Fêsel Yûsif: Divê demildest lêvegera Kurdî ava bibe

Endamê Desteya Serokatiya ENKS'ê Fêsel Yûsif da zanîn ku astengiya pêşiya şandeyê ew e ku hikumeta veguhêz pêşwaziya şandê nake û lêvegera Kurdî ava nabe û got, “Divê demildest lêvegerke Kurdî ava bibe, ji ber ku ew ê rê li ber xebata şandeyê û çûyîna Şamê veke.”

**Hemza Sêvo/Qamişlo**

Di 26'ê Nîsanê de Konferansa Yekhelwestiya Kurdî li Rojavayê Kurdistanê bi beşdariya tevahiya pariyên Kurdî li Rojava li dar ket. Herwiha piştî vê konfer şandeyek li gorî xalên wê ku nûnertiya gelê Kurd bike û diyalogê bi hikumeta veguhêz re pêkbîne. Ji wê demê heya roja îro êdî hewldanên diyalogê tên kirin, lê hîna jî şande hevdîtin bi hikumeta veguhêz a Sûriyê re pêkneaniye. Derbarê heman mijaran, endamê Desteya Serokatiya Encûmena Niştîmanî ya Kurd li Sûriyê (ENKS) Fêsel Yûsif ji rojnameya me re axivî.

**‘Xebata şandeyê û peywendiyên partiyan bi hev re baş in’**

Yûsif destnîşan kir ku xebata şandeyê û têkiliyên partiyên Kurdî bi hev re di asteke baş de ne û wiha bi lêv kir: “Piştî lidarxistina Konferansa Yekhelwestiya Kurdî heta roja îro şandeyek hate avakirin da ku danûstandinan bi hikumeta veguhêz ve bike. Di destpêka meha 6'an de ev şande hat avakirin, ew xwedî nerîna yekhelwesiya Kurdî ye ji bo çareserkirina pirsgirêka Kurdî di Sûriyê de. Xebata wê ew e ku diyalogê bi hikumeta veguhêz re bike û bigihêje encaman di warê bidestxistina mafê gelê Kurd, aramiya Sûriyê û demokrasiya wê. Ev şeş meh li ser avakirina şandeyê derbas bûn, me ji destpêkê ve agahiya çûyîna Şamê ji hikumeta veguhêz re gotiye, lê heta niha bersiv ji aliyê hikumeta veguhêz ve nehatiye. Niha şanda Kurdî civata li dar dixe, herwiha têkliyên di navbera partiyan baş tên meşandin. Da ku lihevkirineke di navbera nerînên hemû aliyan de çêbibe, nerîna partiyên Kurdî gotûbêj dibe, ev xebat jî gaveke baş e.”

**‘Em amade ye ji bo avakirina lêvegereke Kurdî’**

Fêsel Yûsif da zanîn ku ENKS'ê amade ye ji bo avakirina lêvegereke Kurdî û wiha got: “Wekî tê zanîn ji bo hevrêziya Kurdî konferansek hat lidarxistin, ji wê bi şûn de me xwest ku hin gavên din werin avêtin. Pêwîstî êdî bi lêvegereke Kurdî çêbû, ji bo pêkanîna nerîneke hevbeş a xwedî biryar. Ne tenê ji bo konferans û şandeyê, lê belê ji bo hemû awayan pêdivî hebû ku lêvegereke giştî derencama konferans de ava bibe. Ji aliyê me weke Encûmena Niştîmanî ya Kurdî projeyek girêdayî avabûna lêvegereke Kurdî pêşinyarî PYD'ê û hemû partiyên siyasî kiriye. Di heman demê de jî me ev proje ji genêral Mezlûm Ebdî şandiye da ku lêvegereke Kurdî li Rojavayê Kurdisatên çêbibe, lê hîna ev yek bi cih nehatiye Ev lêveger jî eger ava bibe tekez divê li gorî belgenameya Konferansa Yekhelwestiya Kurdî be. Ev belgenameya ku ji salên piştî 2012'an ve cihê nîqaşê bû, lihevkirin



li ser nedihat kirin, di dawiyê de jî her ev belgename ji bo doza gelê Kurd maye. Ew lêveger bibe berpirs ji bo gelê Kurd li tevahiya herêm û bajarên Kurdî û hemû alî bi hev re bibin xwedî erk di warê rêvebirinê. Avakirina lêvegerê hêsan bûye piştî lidarxistina konferansa Kurdî.”

**‘Astengî; Şam pêşwaziya şandê nake û lêvegera Kurdî ava nabe’**

Yûsif diyar kir ku astengiya li pêşiya şandeya Kurdî ew e ku hikumeta veguhêz erêkirin li ser vexwendina ji bo hevdîtinan nekiriye, li aliyekî din lêvegerke Kurdî ava nebûye û wiha domand: “Yek ji astengiyên ku derdikevin pêşiya hevrêziya Kurdî û şandeyê ew e ku hîna lêvegereke Kurdî ava nebûye. Eger lêvegerke were avakirin wê rê li ber pêşiya şandeya Kurdî vebe û dibe ku hevdîtinan bi hikumeta veguhêz re çêbike. Ew ê bibe berbirs di çarenivîsa gelê Kurd de ji aliyê siyasî, ewlehî, berevanî û hwd… herwiha wê xebata lêvegera Kurdî berfirehtir be ji karê şandeyê. Lêvegera Kurdî gelekî girîng e, divê lêvegereke ku ne tenê ji bo mijara şandê bi hikumeta veguhêz xebatê bike, lê belê ew lêveger xwediya biryarê be, bikaribe ofîs û komîteyan çêbike hem têkliyan bi hemû alyan re ava bike û dengê gelê Kurd bigihîne derdorê. Astengiya din jî hikumeta veguhêz heta roja îro pêşwaziya şandeyê nekiriye, hîna vê hikumetê daxwaz nekiriye ku şande biçe Şamê. Êdî em dibêjin dem hatiye ku şande were vexwendin ji hêla hikumeta veguhêz û here Şamê.”

**‘Eger Kurd di qonaxa nû ya Sûriyê de bin wê serkeftî be’**

Endamê Desteya Serokatiya Encûmena Niştîmanî ya Kurdî li Sûriyê Fêsel Yûsif tekez kir ku eger gelê Kurd di qûnaxa nû de be wê ev qonax serkeftî be û wisa got: “Ji roja ku Sûriyê bûye gelek pêkhate tê de dijîn. Di Sûriyê de gelê Kurd, Ereb, Suriyan û hwd… hene, divê mafê hemû netewan di destûr de misoger bibe, piştre mijara rêvebirinê û mijarên siyasî werin nîqaşkirin. Eger hikumeta veguhêz ji dil dixwaze mafê pêkhateya Kurd bide, wê projeyên înkar û tunekirinê yên ku ji hêla hikumeta Baas ve dihat meşandin, bi dawî bike. Divê gelê Kurd şirîka sereke di hemû waran de li Sûriyê bi taybet qonaxa nû. Sîstema navendî di serdema Baas de hişt ku Sûriyê bigihêje asta wêraniyê. Piştî hatina hikumeta Sûriyê êdî heta niha tiştek nehatiye guhertin, vegera li sîstema navendîbûnê jî wê me vegerîne wê serdema xerab a rêjîma Baas.”

# Heta hişmendiya faşist û inkarê bi dawî nebe Tirkiyeke demokratîk ava nabe

**Reşo Mihemed**

Zêdeyî salekê ye ku Bahçelî destê aştiyê dirêjî Rêber Apo û gelê Kurd kir. Rêber Apo jî di 27'ê Sibatê de banga destpêkirina pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk kir. Ji wê demê heta roja îro gavên bi nirx ên aştîxwaziyê ji hêla PKK'ê ve hatine avêtin. Êdî Rêber Apo bi nameyên xwe ji hemû warî ve ji bo Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê heyanî Bakur û Rojhilatê Sûriyê dane. Lê hikumeta Tirkiyê hertim bi rola xerab û ya dijber li dijî pêvajoya aştiyê lîstiye, hem li Sûriyê û hem jî Tirkiyê. Dewleta Tirk di warê gavavêtina hiqûqî de hîna gavên aştiyê û rêveçûna wê neavêtine. Gava ku avêt û hinek erênî pêkanî jî avakirina komîsyonê bû, destpêkê jî xwestin navê Tirkiya Bêteror li wê komîsyonê bikin, lê ev yek nehate



qebûlkirin. Ruxmî peyva terorê li ser lêvên dewleta Tirk û rayedarên wê nedihat bikaranîn jî, lê dilê wan dagirtî bû, hîna jî dagirtî ye. Hakan Fîdan Yaşar Guler û Îbrahîm Kalin çûn Sûriyê. Wê rojê li Helebê, li ser taxa Şêxmeqsûdê êriş hatin kirin. Ji bo bicihanîna Peymana 10'ê Adarê gelek derdor hewl didin. Me dît ku ev çûyîn çi encam bi xwe re anîn. Serdana Tirkiyê ji Şamê re tenê ji bo dosya QSD'ê bû, tenê ji bo hikumeta veguhêz, alîgirên wê û çeteyên ku di bin baskê xwe de gur bike li dijî QSD'ê. Me ev yek bi çavan dît dema ku di heman rojê de êrîş li ser Şêxmeqsûd û Eşrefiyê çêbûn, hinceta derew jî ew bû ku (QSD) êrîş kir, wekî tê zanîn Hêzên Sûriyaya Demokratîk ji 1'ê Nîsana 2025'an ve ji herdu taxan derketine. Êriş û binpêkirin li ser herdu taxan berdewam in, her car gurtir dibin dema ku Tirkiyê diaxive. Piştî wê Hakan Fîdan li ser ragihandina Tirkiyê derket da ku dîsa bêje Tirkiyeke bêteror. Hemû kes dizanin ku wateya terorê rêxistina ku tirsê dike dilê sivîlan, şer li şûna aramiyê diçîne, nefretê û kîndariyê diafirîne, hem jî kuştin û komkujiyan li ser gelan de çêdike. Tu caran PKK xebateke wiha ji destpêka damezirandina xwe ve heya roja îro pêkneanîne. Berovajî vê yekê, wê li Şengalê, Mexmûr, Başûrê Kurdistanê, Bakur û Rojhilatê Sûriyê şerê DAIŞ'ê kir, herwiha gelên herêmê ji kirîzeke bêdawî ya terorê parast. Di necamê de jî bi dehan şoreşger ji refên PKK'ê di qada serbazî, siyasî, civakî û hwd… li ser destê DAIŞ û dewleta Tirk hatin şehîdxsitin. Lewma divê ku Tirkiyê baş bizanibe û qebûl bike ku PKK'ê tevgereke û ew xwedî dozek a pêkanîn û parastina mafê gelê Kurd û gelên herêmê ye. Hem jî divê AKP û MHP'ê baş bizanibin heta hişmendiya faştî û inkarê bi dawî nebe Tirkiyeke bêteror ava nabe. Ji ber ku teror ne di hişmendiya PKK'ê de ye, teror di hişmendiya tarî ya inkarkirin û faşistiyê de ye. Kilîda çareseriyê li pêş her kesî xuya ye, kilîda wê, demokrasî ye.



## Hikumeta veguhêz dawiya xwe nêzîk dike!

**Dilyar Cizîrî**

Li ser banga Lêvegerê Ruhî yê Civaka Ewlewî li Sûriyê Şêx Xezal Xezal roja 28'ê kanûnê li 28 bajar û bajarokên Perava Sûriyê bi dehezaran kes daketin qadan. Civaka Elewî di çalakiyên xwe de doza federalîzim, nenavendî û rakirina zordariyê kirin. Hikûmeta veguhêz a Sûriyê ya komkujiyên Peravê û Siwêda pêk anîn. Vê carê jî nikarîbû xwe li daxwazên xelkên Peravê ragire.
Li hin bajaran ji ber êrişa li dijî gelê bi aştiyane çalakiyên xwe lidar dixistin, hejmarak şehîd û birîndar çêbûn. Li hin bajaran rê li xwepêşandan hate giritin. Heta niha jî hîn alîgirên hikûmeta veguhêz li Humis, Hema, Laziqiyê û Tertûsê êrişî gundên Elewiyan dikin. Di encam de bi van nêzîkatiyan isbat dibe hikûmeta veguhêz a Sûriyê di pêkanîna çareseriyeke mayînde de xetimiye. Hikûmeta ji rojên destpêkê de di bin baskên dewleta Tirk de tevdigere wiha fam kiriye bi çend hevdîtinên dîplomasî li welatên cîhanê re ewê karibe hebûna xwe mayînde bike.
Ew çiqas bi derve re hevdîtinên dîplomasî bike, heger di civaka Sûriyê de bawerî neyê avakirin, çareserî ne pêkane. Me di destpêkê de jî behsa komkujiyên Peravê û Siwêda kir. Piştî wan komkujiyan me got qey hikûmeta veguhêz ji van ezmûnan dê sûdê werbigre û rê nede komkujî û zodarî dubare bibe. Lê piştî zêdeyî salekê ji hilweşîna rêjîma Esed, em dinerin her çend rojan li dijî herêmekê Sûriyê dorpêç, êriş û kîndarî tê meşandin. Gefa wan a li dijî herêmên Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê û dorpêça li dijî taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê jî beşek ji bê çareseriya vê hikûmetê ye. Ew bi nêzîkatiyên xwe rêjîma berê dubare dike. Ev jî xetimîn û bêçareseriyê mestir dike.
Balkêşe di vê rewşê rayedarên hikûmeta wekî hikûmeteke mayîndeye, gavan davêje. Ev ji daraza destûrê destpê dike. Erkdarkirina wezîran û herî dawî jî roja 29'ê mehê çapkirina pereyên nû yên Sûriyê, dewam dike. Di vir de nakokî heye. Heger ew hikûmeteke veguhêze, çawa dikare bêyî li civakê vegere ewqas gavan ji ber xwe ve bavêje?. Di aliyê qanûnî de ne pêkane çend kes biryarên niştimanî li şûna bi milyonan gelê Sûriyê bigirin. Ev nêzîkatiyeke din a wan ber hilweşîn û tunebûnê ve dibe ye.
Lê di vir de êş û azerên gelê Sûriyê yên bi salane ji ber zordariya yekdesthlatiya rêjîma Baas jiyan kiriye kûrtir dike. Kîndariya di nava civakê de mestir dike. Ji ber wê jî hikûmeta veguhêz nikare di pêkanîna xalên peymana 10'ê Adarê de gavan bavêje. Heger wiha dewam kir û texmîna min wê dewam bike. Ji ber hikûmeta veguhêz nema dikare ji bin bandora siyasetên xwe û destwerdana derve derkeve.
Hikûmeta veguhêz çiqasî bibe alîgirê Koalîsyona Navdewletî ya li Dijî DAIŞ'ê û çiqsî bi Serokê Amerîka û welatên din ên cîhanê re hevdîtinan pêk bîne. Di vê rewşa heyî û bê bawerî ya wê bi civaka Sûriyê re wê tune be. Ji ber ji roja yekem a hatina wê teqlîda desthilata beriya xwe dike. Di dawiyê de dê çarenûsa wê jî wekî ya berê be.



# ‘Bendava Tişrînê bû kelha berxwedanê’

Berxwedêrên ku bûn şahidên wan kêliyên dîrokî yên berxwedana Bendava Tişrînê diyar kirin ku berxwedana Tişrînê bi saya lehengiya şervanên azadiyê û sekna berxwedêr a gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi ser ket.

**Solîn Mihemed/ Qamişlo**

Dewleta Tirk a dagirker bi rûxandina rêjîma Baasê a Sûriyê re di 8'ê Kanûna 2024'an de ji bo ku statuya Rêveberiya Xweser a li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê têk bibe û qada xwe ya dagirkeriyê li Sûriyeyê berfereh bike, pêleke nû ya êrişê da destpêkirin. Ew jî hedefgirtina çavkaniya jiyanê ya xelkên herêmê û hedefgirtina Bendava Tişrînê bû. Piştî dagirkirina bajarê Minbicê dagirkeriyê bi tank, top, balafirên şer yên bêmirov û biçek, obus, moşek û hawanan berê êrişên xwe dan Bendava Tişrînê û Pira Qereqozaxê.
Li hember êrişên namerdane yên Dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê, hêzên leşkerî li bendavê bi pêşengiya Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) barê parastina xak û gelê xwe hilgirtin ser milan û bi hev re di eniyên pêş de şerê man û nemanê meşandin. Li kêleka berxwedana lehengane ya şervanan, xelkên heremê bi baweriya ku “Bendav bendava me ye” û bi felsefeya “em ji mirinê mezintir in” hevgirtina xwe avakirin û biryar dan ku ji bo parastina ceyran, av û axa xwe berê xwe bidin bendavê.
Piştî 119 rojan ji berxwedanê bi saya gel û şervanên azadiyê berxwedana bendava Tişrînê navê xwe di rûpelên dîrokê de her mayinde hişt û bi ser ket. Bendava Tişrînê bû şahidê destaneke ku nayê ji bîrkirînê.




Mihiyedîn Hesen



Gelewîş Eusman

Di derbarê salvegera berxwedana Bendava Tişrînê de, endamên Meclisa Malbatên Şehîdan Mihiyedîn Hesen û Gelewîş Eusman ku cihê xwe di nava berxwedana bendava Tişrînê de girtibûn ji Rojnameya me re axivîn.

**‘Berxwedaniya bendava Tişrînê dîrokî bû’**

Mihiyedîn Hesen diyar kir ku berxwedaniya bendava Tişrînê berxwedaniyeke dîrokî bû û wiha anî ziman: “Çûyîna me ya bendavê ji bo ku em piştgirtiyê bidin şervanên xwe. Gel bi rihê gelê şoreşgerî berê xwe da bendavê û bi şervanên azadiyê re bûn yek. Dijmin dixwest bendavê dagir bike, lê berxwedana gel û şervanan plana dijmin vala derxist. Tevî ewqas êrişên dagirkeriyê yên giran jî lê me serê xwe ji wan re netwand. Ji xwe 25 hevalên me şehîd bûn û bi sedan birîndar bûn lê îradeya gel nehat şikandin û 118' e rojan gel berxwedaniyeke birûmet da meşandin. Li bendava Tişrînê hat isbatkirin ku gelê me fedekar û berxwedêre, heta kêliya dawî jî berxwedana gel ranewstiya. Me bi biryardariyeke mezin got ku em bendavê bernadin û em li ser soza xwe man, me bendav bernda heta ku serkefti hat bidestxistin. Bendava tişrîn bû keleha berxedanê li hemberî dagirkeriyê.”

**‘Bi saya şehîdên qeherman em gihaştin destkeftiyên îro’**

Mihiyedîn Hesen axaftina xwe wiha qedand: “Berxwedaniy bendavê berxwedaniya Kobanê tîne bîra me. Li bendavê gelek dayîk birîndar bûn û digotin ku ew ji mirinê mezintirin. Di berxwedana Bendavê de ji Qamişlo ji welatî şehîd bûn, ji wan 2 endamên Meclisa Malbatên Şehîdan bûn ku xwedî kedeke mezin di şoreşa Rojava de bûn. Eger ew bendav ketiba destê dijmin, wê dijmin berê xwe daba Kobanê, Tebqa, Reqa û hwd... lê di encama berxwedaniyê de dijmin têkçûn û bi vîna şoreşgerî gel û şervan bûn yek û planên dijmin vala derxistin. Di vê şoreşê de nêzî 14 hezar şehîd hatin dayîn, ne bi hêsanî ku em gihan vê asta ku îro em tê de jiyan dikin. Em wek malbatên şehîdan, em soz didin ku em ê şopedarê riya şehîdan bin.”

**‘Em bi berxwedana Bendava Tişrînê serbilindin’**

Gelewîş Eusman jî anî ziman ku ew bi berxwedana dîrokî ya Bendava Tişrînê û wiha got: “Ji bo ku em alîkariya hevalên xwe yên QSD' ê bikin û li hmberî dijmin bibin mertal me berê xwe da bendavê. Li bendavê moralê me pir xurt bû , ji ber ku me piştgiriya şervanên xwe dikir û axa xwe diparast. Em û şehîd bavê Teyar bi hev re çûn bendavê, me berê xwe da bendavê wekî ku em herin serhildanekê. Dijmin êriş kir û di encamê şehîd û birîndar çêbûn, me şehîdên xwe rakir û me birîndarên xwe jî derman kir.Tevî êrişên giran yên dagirkeriyê jî me xwe paş de negişand û berxwedaniya me heta serkeftinê dewam kir.”

# Bi hatina zivistanê re zehmetiyên koçberên Efrînê zêde dibin

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**

**Bi hatina zivistan û sermayê re, êşa bi hezaran koçberên ji bajarê Efrînê ji nû ve zêde dibe û barê wan girantir dibe. Ew di nav şert û mercên mirovî yên dijwar de ne, ji pêdiviyên herî bingehîn yên jiyanî bêpar in.**

Ji ber êrîşên li ser bajarê Efrîn û derdora wê, niştecihên wê ji cih û warên xwe koç kirin û bi salan e li kamp û deverên penaberan ên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê dijîn, herwiha ew neçar man ku li dibistanên kevin û avahiyên perwerdehiyê yên terikandî bijîn. Ev dibistan, ku berê ji bo cihên perwerde û avakirina pêşerojê hatibûn çêkirin, îro ji bo malbatên ku ji ber serma, xizanî û bêîstîqrariyê westiyane bûne
Ji dema koçberbûna wan piştî êrîşên li ser Efrîn, xelkê koçber di navbera çend deveran de bar kirin, berî ku bi sedan malbat li dibistanên kevin ên ku pêdiviyên herî bingehîn ên ji bo jiyanê peyda nakin, bi cih bûn. Ew ji ber sermayê şevên dirêj bê xew derbas dikin. Zarok dilerizin û tenê betaniyên wan yên tenik hene ku wan ji sermayê naparêzin. Her zivistan, ew ji nexweşiyê bêtir ji birçîbûnê ditirsin. Bi hezaran malbatên ku ji kêmbûna giran a germkirinê dikişînin, nemaze bi zêdebûna berdewam a bihayên mazotê û zehmetiya bidestxistina wê.

**Sermaya zivistanê qelsiya şert û mercên jiyanê eşkere dike**

Bi barana pêşîn re, êşa li van dibistanan dest pê dike, ji ber ku av ji banên şikestî diherike, hewş û korîdoran tijî av dike, di heman demê de odeyin hene bê pencere û deriyên saxlem in. Her ku germahî di şevê de dadikeve, ode sarbûna wan dijwar dibin û ji bo zarok û xtiyaran ne guncaw dibin.
Zarok û kesên temen mezin herî zêde ji van rewşan bandor dibin, ji ber ku nexweşiyên zivistanê yên wekî êşa singê û sermayên giran di nav xizmetên bijîşkî yên nebaş û kêmbûna dermanan de belav dibin.

**Zehmetiyên aborî û kêmbûna alîkariyên**

Êş û azar ne tenê bi pirsgirêkên tenduristiyê ve sînordar e, ew digihîje şert û mercên jiyanê yên bingehîn jî. Piraniya malbatan xwe dispêrin alîkariya mirovî, ku pir caran têrê nake an jî ne rêkûpêk e û pêdiviyên bingehîn



pêk naynin, nemaze di zivistanê de, ku ev yek lêçûnên zêde ji bo germkirin û cil û bergan hewce dike. Bi kêmbûna piştgiriya alîkariyê re, penaber bi zivistanek dijwar re rû bi rû dimînin bêyî xwarin an cilên zivistanê yên têr. Ev hewildanên alîkariyê pir caran bi sînor û bêrêkûpêk in.

**Tevî dijwarbûna koçberiyê jî, hêviya vegerê heye**

Tevî ku sal di ser koçberbûna wan re derbas bûne jî, penaberên Efrînî hîn jî bi hêviya vegera malên xwe ve girêdayî ne û tekez dikin ku êşa wan tenê bi rakirina sedemên bingehîn ên koçberbûna wan û garantîkirina vegera ewle û bi rûmet dê bi dawî bibe. Heta ku ev yek çênebe, zivistan ceribandinek dijwar a berxwedana wan e û bangek vekirî ye ji bo civaka navneteweyî ku berpirsiyariyên xwe yên mirovî li hember vê krîza dirêj bigire ser xwe. Ew her sal ji bo zivistanê hewcedariya pêdiviyên germkirinê û xwarinê heye, lê di bin zor û zehmetiyan de ne.
Li deverên kêm ewle û di bin ezmanekî tijî baran û sermayê de, penaberên Efrînî bi zivistanek din a tijî êş û azaran re rû bi rû dimînin, li benda çareseriyên rastîn in ku wan ji hovîtiya koçberiyê rizgar bikin û mafê wan ê jiyaneke ewle û bi rûmet vegerînin.

## Bîra Civakê



## Di civakê de pirsgirêka malbatê

**Ehmed Hesen**

Rêbertiya me malbatê weke saziya pêşîn a dewletdariyê pênase dike û di heman demê de weke şêweyê duyemîn ê dewletdariyê dide pênasekirin. Di rastiya têgîna malbatê de her çend pirsgirêkên cidî nebin jî, lê di piratîzekirina wê de şaşîtiyên dîrokî tên jîyîn, saziya ku malbat jê re tê gotin kokên wê heta dewleta şareza ya rahîbên Sumer û împeratoriyên yekdestdar diçe, gumana mezin ku ji beriya wan jî bi şêweyekî cuda malbat derketiye pêş û heta roja me ya îro herikiye, di heman demê de ji bo zêdekirina ferdên civakê çêkera malbatê di kesayeta jin de weke amûreke pirkirina serjimariyê tê bikaranîn, mirov li vir gotina rêber Apo ya ku dibêje “jin weke amûra zarokanînê di sîstema kapîtalîzmê de bingeh tê girtin” piştrast dike û wateya herî berbiçav a vê rastiyê ye. Malbatkirin ne rastiyeke şaş a civakî ye, berovajî wê hebûnek e ji bo dîzaynkirin jiyana civakî, lê di asta dîrokê de ev sîstema malbatê gihîştiye asta ku qurişek jî neke û ji bo mezinkirina fînansa hêzên kapîtalîst bibe amûreke perezêdekirinê.
Di nava vê hevkêşeyê de ferdê civakî bi zincîrên mehkûmkirî yên adet û kevneşopiyên malbatî tê fetisandin û li dora şaştiyên dîrokî dizîvire, ta ku zilam nebe leşkerekî serkeftî yê dewletê, her tim bi têkçûnê re rû be rû ye û mafê wî yê jiyanî winda dibe, di nav de jin tê asîmîlekirin û ji qadên civakî hema bêje tê qutkirin. Niha di sîstemên dewletên netewe yên Rojhilata Navîn de hem jin û hem zilam bi vê yekê xapiyane, li beramberî jiyaneke asayî azadiya ferd tê firotin, li beramberî fatoreyên ku dewlet ferz dike jiyana hevbeş ji holê hatiye rakirin, a ku maye bê îradebûneke mezin e, koletiya herî pêşketî ye. Em niha di serdema teknolojiyê de xirabûn û têkçûna mejiyê civakî jiyan dikin, malbatên ku tenê li pey xwezêdekirin û xwetêrkirinê pir zêde dibin û di encamê de pirsgirêkên azadî, tenduristî, perwerdehî û zayendî zêde dibin, di çavkaniya hemû pirsgirêkan de jî malbata îro serkêşiyê dike û jiyan vediguhere bajarekî ku atom lê ketî. Encam zarok bê perwerde mezin dibin, pirsgirêka zanebûnê kûr dibe, rêgezên civakî tên bombekirin û dawî lê tê. Gava ku em li serê werîsê çareseriyan lêbikolin, em dikarin di kesayeta zilamtiya ku hatiye asîmîlekirin û dewleta ku her tiştî di kesayeta civakê de dide înkarkirin de bigihêjin encameke darîçav, heta ku malbat ji vê şêweya xwe ya dubarekirin û zêdekirina ziriyetê gav paşve neavêje, wê civak bi kawosa qeyranan re rû be rû bimîne, ji bo civakeke demokratîk komînalîteya ku Rêber Apo wê bingeha digire hem dikare bibe kilîta çareseriya pirsgirêkên civakî, hem jî modeleke rastîn a jiyana bi rûmet e.